ROJEV
16 Nisan - Pêncşem 2009 Buha: 50 Kr Hejmar: 1

## El-Haşîmî: Bila Tirkiye li Başûr baregeh veke

**Piştî dîplomasiya nav Amerîka, Tirkiye, Iraq û rêveberiya Herêma Federal a Kurdistanê ya li hemberî PKK'ê hewldanên neyartiyê jî gav bi gav têne avêtin. Cîgirê Serokomarê Iraqê bi daxuyaniyekê helwesta hikûmetê Iraqê ya ku dixwaze cihê avakirina baregehê bide Tirkiyeyê aşkera kir. Cîgirê Serokomarê Iraqê Tariq El-Haşimî ragihand ku ew ê destûrê bidin Tirkiyeyê ku li ser axa Iraqê li dijî PKK'ê baregehên leşkerî ava bike...** RÛPEL - 6

9

### Azadiya Welat...

Ez ê gavekê pêşde biçim û hemû gunehê bavêjim stûyê 'konsepta nû' û girtina Azadiya Welat jî binim ser vê sêlê û bihêlim... OMER DILSOZ



8

### Rênas û Gernas...

Dengê wan zarokên bajarokê Barmanê wê xelatî karwanên şehîdan bike. Barmanî bi hûr û girên xwe ew pêşwazî kirin... SERKEFT BOTAN



8

### Girtina Azadiya Welat...

Piştî girtina Azadiya Welat, min ji nivîskarekî kurd xwest ku li ser nivîsekê binivîse... Bersiva wî dilê min dax da... MEDENÎ FERHO



# Provokasyon

Operasyona li hemberî rêveberên DTP'ê û rêveberên saziyên kurd, gel daxist kolanan. Li Amedê deh hezar kes meşiyan. Êrîş wekî provokasyon hate binavkirin. KCK'ê aşkera kir ku êrîşên li ser gel bidomin ew ê biryara xwe ya şernekirinê di ber çavan re derbas bikin



### LI AMEDÊ MEŞA MEZIN

Operasyona li dijî DTP'ê li Amedê bi meşek beşdariya 10 hezar kesî hate şermezarkirin. Baydemîr di daxuyaniyê de bang li hikûmetê kir û xwest ku dest ji şer û polîtîkayên kuştinê berde. Wekîlê Serokê Koma DTP'ê Selahattin Demîrtaş jî xwest hevalên wan demildest bên berdan.

### LI GELEK BAJARAN ÇALAKÎ

Operasyona li dijî DTP'ê li 15 bajaran hevdemî pêk hatî li Erzincan, Mêrdîn, Êlih, Dêrsim, Semsûr, Riha, Şirnexê, Wan, Mûş, Enqere, Çanakkale, Aydin, Bursa, Stenbol û Îzmîrê hate şermezarkirin. Polîsên mudaxeleyî daxuyaniya li navçeya Dêrika Mêrdînê kir... R.4

### KCK: EM Ê REWŞÊ BINIRXÎNIN

Koma Civakên Kurdistanê operasyonên pêr ên dewleta tirk, wekî êrîşeke li hemberî îradeya gelê kurd û sabotekirina hewldanên çareseriya demokratîk nirxandin. KCK'ê operasyon wekî êrîşa li dijî îradeya gelê kurd nirxand û got îdiayên çapemeniyê derew in... R.4

*Edîtor*

## Silaveke dilşikestî

Di demeke ku behsa diyalog û çareseriya demokratîk dihate kirin de, dewletê dîsa pêleke dijwar a tundiyê da destpêkirin. Yek ji destpêka vê êrîşê jî girtina dibistina rojnamegeriya kurdî Azadiya Welat bû.

Her wekî dihate texmînkirin ku girtina Azadiya Welat ne nîşaneya xêrê bû û piştî vê kirina nedemokratîk û nehiqûqî pêleke mezin a binçavkirin û girtinê hat destpêkirin. Watedar e ku êrîş û zordariyên bi vî rengî tim bi çapemeniya muxalîf dest pê dikin.

Vê carê Azadiya Welat bi girtinê û Gun TV'ê jî bi serdagirtinê para xwe ji vê pêla bêyom girt.

Kî çi dibêje bila bêje pirsgirêka kurd bi operasyon, binçavkirin û êrîşên li ser sazî û dezgehên kurdan nayê çareserkirin û berevajî vê yekê kirinên bi vî rengî dê pirsgirêkê girantir bikin.

Her wiha diyar e ku hin derdorên li Tirkiyeyê xwedî erk û hêz ji bangên diyalog, aştî û biratiyê aciz dibin.

Gava behsa aştî û diyalogê tê kirin, ew derdor wekî gayê rengê sordîtî bi qiloçên xwe êrîşî aştîxwazan dikin.

Em van êrîş û zordariyên di dema dawî de bi vî rengî dinirxînin û wisa jî bi nav dikin.

***

Belê; em wekî Rojev piştî girtina Azadiya Welat bûn rêwiyên mecbûrî yên vê riya pîroz. Ji ber vê yekê jî ev silava ku em didin we her çiqas ji kûrahiya dilê me bê jî dîsa dilşikestî û xemgîn e.

Lê ligel vê atmosfera bi mij û moran, ligel barebara dengê şerxwazan jî em ji vê silava ji neçariyê kêfxweş û şad in.

Kêfxweş in ji ber ku em li ser mîrasa Azadiya Welat û gelek rojnameyên din ên bi kurdî, bi tecrûbeyeke mezin dest bi vî karî dikin.

Kêfxweş in ji ber ku dîsa hûn ê bibin xwedî maf ku bi zimanê xwe yê dayikê pêşveçûn û qewmînên li welat û derveyî welat bişopînin û bixwînin...

Bi hêviya ku di 'Rojev'a me de her tim aştî, biratî û azadî hebe...

*Rojev li we pîroz be!*

**ROJEV:**

Li Farqînê lêkolînê bikin... R.3

Kaseta *Koma Navîn* derket... R. 9

Li lûtkeya tunetiyê... R.9


# Operasyonên sabotekirinê

## Bi salan e li aştiyê digere

PKK'ê di salên 1993, 1995, 1998, 1999 û 2006'an de 5 caran agirbest îlan kir. Lê her 5 caran jî destê ji bo aştiyê hatibû dirêjkirin bi çîroka "Dewlet bi terorê re bazariyê nake" bi dawî dibû... RÛPEL - 2

Bi benzînê diçin ser agir...
Tayîp TEMEL - Rûpel 2

Dewlet hilbijartinê çawa dinirxîne...
Sercan AYDIN - Rûpel 8



Dewleta Tirk, ligel helwesta KCK'ê û gelê kurd a ku pirsgirêka kurd bi riya diyalogê bê çareserkirin êrîş û operasyonan didomîne. Operasyonên ku li her devera Kurdistanê hatiye destpêkirin pêvajoyê provoke dike. Li Kurdistanê bi hatina biharê operasyon her diçe zêde dibin. Di 2 hefteyên dawî de ligel biryara KCK'ê ya bêçalakiyê li gelek herêmên Kurdistanê operasyonên leşkerî yên Artêşa Tirk bênavber didomin... RÛPEL - 3

# PKK 16 sal in ji bo aştiyê li muxataban digere

M. NURÎ EKÎNCÎ - NALÎN PENABER / ANF

**Ji sala 1993'yan û pê de Tevgera Azadiya Kurdistanê dixwaze pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û aştiyane bê çareserkirin. PKK'ê heta niha 5 caran agirbestên yekalî îlan kirine. Lê dewleta tirk destê ji bo aştiyê hatiye dirêjkirin her tim weke zeîftiye nirxandiye**

PKK'ê di salên 1993, 1995, 1998, 1999 û 2006'an de 5 caran agirbest îlan kir. Di agirbesta 1999'an de gerîla hêzên xwe ji bakurê Kurdistanê vekişand. Lê her 5 caran jî destê ji bo aştiyê hatibû dirêjkirin bi çîroka "Dewlet bi terorê re bazariyê nake" bi dawî dibû. PKK ji 13'ê nîsanê pêde di pêvajoyeke ku operasyon zêdebûne de heta 1'ê hezîranê biryara bêpevçûnê wergirt.

PKK'ê ji sala 1993'yan û heta niha her tim dixwaze pirsgirêka kurd bi riyên aştiyane bê çareserkirin. Ji destpêka bihara 1993'yan PKK'ê heta niha 5 caran agirbestên yekalî îlan kiriye. Dewleta Tirk her tim bi nêyînî bersiv daye û xwestiye bi riya şîdetê pirsgirêka kurd çareser bike.

Di sala 1993'yan de Rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan ji bo pirsgirêka kurd bi riyên siyasî û demokratîk bê çareserkirin, ji raya giştî re aşkera kir ku wan agirbesta yekalî îlan kirine. Ocalan di daxuyaniya çapemeniyê de got ku lêgerîneke wan a ji Tirkiyeyê veqete tune û li muxatabekî digerin. Ocalan ji bo agirbesta ku ji 20'ê adarê heta 15'ê nîsanê wiha gotibû: "Pêngava ku ji 15'ê Tebaxê hatiye destpêkirin an jî bi navekî din serhildana kurd di vê 9'emîn sala xwe de yanî di bihara 1993'yan de gihîştiye qonaxeke girîng. Pêvajoya biharê di heman demê de destpêka pêvajoya pevçûnên germ e. Cejna Newrozê dê çend rojên din bê pîrozkirin. Çi gelê Tirkiye û çi gelê Kurdistanê çavên wan li vê rojê ne. Hêviyên xwe yên ji bo bi awayekî aştiyane çareser bikin tînin ziman."

**Ocalan li muxatab digere**

Ocalan, daxuyand ku ew weke alîgirekî pirsgirêka kurd li muxatabekî digerin. Lê li hemberî vê niyeta baş a PKK'ê rantxurên şerxwaz û çeteyên di hundirê dewleta Tirk de serokomarê wê demê Turgut Ozal ku daxwaza agirbestê kiribû hate jehrdayîn. Di heman pêvajoyê de operasyona leşkerî ya dagirkirina Kurdistanê li seranserî welat dest pê kir. Ligel operasyonan bi hezaran welatparêzên kurd, rewşenbîr, nivîskar û rojnameger ji aliyê çete û kontrayên dewletê ve hatin kuştin.

Ji vê pêvajoyê heta PKK di sala 1995'an de agirbest îlan kir li Kurdistanê zêdetirî 4 hezar gund hatin valakirin, bi milyonan kurd ji cih û warên xwe bûn. Di heman demê de bi milyonan kurd ji îşkenceyan derbas bûn û xistin girtîgehan.

Mîmarên konsepta 1993'yan Dogan Gureş û Tansû Çîller di operasyona îmhayê ya li hemberî kurdan de gelê Tirkiye û Kurdistanê windahiyên giran dan. Careke din derket holê ku bi înkar û îmhayê ev pirsgirêk çareser nabe. Di sala 1995'an de PKK'ê got 'heke şer ji nakokiyeke an jî ji pirsgirêkeke girîng çavkaniya xwe negire dînitiye' û agirbesta duyemîn a yekalî îlan kir.

Lê çeteya Çîller-Gureş ku hebûna wan girêdayî şer bû, şer hêj gurtir kirin. Bi vê yekê jî qîma xwe neanîn û êrîşên xwe veguhestin qada navneteweyî. Di 6'ê gulana 1996'an de bi wesayîteke tijî bombe êrîşeke terorîstî li hemberî Rêberê Gelê Kurd pêkanîn. Ev yek jî hişt ku êdî agirbest wateya xwe winda bike. Li Kurdistanê şer hêj gurtir bû.

**Bersiva agirbestê komplo bû**

Ocalan, di sala 1998'an de got ku dixwazin agirbesteke weke dewama ya 93'yan îlan bikin. Ocalan, got ku di serî de PKK ji bo pirsgirêka kurd bi riyên aştiyane bêçareserkirin her tim di nava lêgerînê de ye.

Ji ser agirbesta 1'ê îlona 1998'an hêj çend saet derbas bûbûn operasyoneke leşkerî da destpêkirin. Di şexsê Ocalan de konsepta îmhayê ku li hemberî gelê kurd hatibû destpêkirin di 15'ê Sibata 1999'an de bi anîna Ocalan a Tirkiyeyê re kete qonaxeke nû.

**Gerîla vedikişin derveyî sînor**

Ocalan, di 1'ê tebaxa 1999'an de li Îmraliyê di bersivdayîna ji bo konseya rêveber a PKK'ê ya 13'ê tîrmeha 1999'an ji bo nirxandina 7 xalan careke din ji bo pêkvejiyaneke demokratîk û aştiyane nêrînên xwe anî ziman. Ocalan di bersivdayîna ji bo Konseya Serokatiya PKK'ê de ji bo hawireke aştiyane ya demokratîk digot ku riya çareseriyê di aştî û demokratîkbûnê de derbas dibe. Ocalan di 2'yê tebaxê de bi daxuyaniyekê xwest hêzên gerîla vekêşin derveyî sînor. Piştî banga Ocalan a 2'yê tebaxê PKK ji 1'ê îlona 1999'an pêde talîmata rawestandina şer da hêzên gerîla.

**Tirkiye pihînê li fersendê dixe**

PKK di 1'ê îlona 1999'an de li ser daxwaza Ocalan koma çareseriya aştî û demokratîk şandin Tirkiyeyê. PKK ji bo aştiyê tiştên ku dikeve ser milê wê pêk dianî. Pêvajoya diyalog û aştiyê berdewam dikir. PKK'ê di kongreya 7'emîn de projeyên ji bo aştiyê dianî ziman. Ligel ku PKK diket rewşa aştiyê, du komên aştiyê şand Tirkiyeyê lê dîsa jî êrîşên dewleta tirk bi dawî nebûn. Hêzên ku vedikişiyan derveyî sînor rastî operasyonên îmhayê dihatin û bi sedan gerîla şehîd ketin.

Êrîşên îmhayê yên dewleta tirk bênavber berdewam kirin. Tirkiye bangên diyalog û aştiyê yên PKK'ê weke zeîftiyê bi nav dikir û planên tasfiyeyê ku PKK'ê ji hundir ve parçe bike berdewam dikir.

Di sala 2004'an de terora dewletê ya li ser kurdan gihîşt lûtkeyê. PKK şeş sal in ku di rewşeke pasîf de bû, derbasî pozîsyona parastina aktîf bû. Di dema parastina pasîf de bi sedan operasyon hatin lidarxistin û di encama van operasyonan de bi hezaran gerîla şehîd ketin.

**Lêgerîn di sala 2006'an de zêde bûn**

Li hemberî êrîşên înkar û îmhaya dewleta tirk KONGRA-GEL di 19'ê gulana 2005'an de hin pêşniyarên nû pêşkêş kir. Koma Komalên Kurdistanê di 15'ê çileya 2006'an de projeya ji 10 xalan pêk dihat pêşkêş kir. PKK'ê tu bersiv dîsa negirt. Konseya Rêveber a KKK'ê vê carê di 20'ê tebaxa 2006'an de careke din bi Deklarasyona Çareseriya Demokratîk di Pirsgirêka Kurd de ji raya giştî re aşkera kir.

**Ji KKK'ê îlana agirbesta 5'emîn**

Serokê Konseya Rêveber a KKK'ê Murat Karayilan di 30'ê hezîrana 2006'an de bi civîneke çapemeniyê cara 5'emîn agirbesta yekalî îlan kir. KKK'ê bi şeş xalan sedemên biryara agirbestê îlan kir. Agirbest dê ji 1'ê cotmeha 2006'an pê de dest pê kir. Karayilan, diyar kir ku di nava sînorên Tirkiyeyê de ji bo çareseriya pirsgirêka kurd dê çi bikeve ser milên wan pêk bîne.

**Bersiva agirbestê jehrdayîn bû**

PKK'ê bi banga hêzên navneteweyî di 1'ê cotmaheta 2006'an de pê de heta roja îro artêşa tirk bênavber operasyonên xwe meşand. Serfermandariya Artêşa Tirk digot heta kesek bimîne dê operasyonên wan berdewam bikin û bi riya şîdetê dê hemû gerîlayan ji holê rake her tim ji raya giştî re aşkera dikir. Her wiha ji bo îradeya gelê kurd a siyasî lînç di nav de şerê psîkolojîk û rêbazên tepisandinê bi kar dianîn. Noqteya herî hesas a gelê kurd û PKK'ê de dozaja tecrîd û îzolasyona li hemberî Ocalan zêde bû û bûyera jehrdayînê hate jiyîn.

**Cara 6'emîn destê aştiyê tê dirêjkirin**

KCK'ê hawira ku bêpevçûn heta 29'ê adarê hatibû îlankirin biryar girt ku heta 1'ê hezîranê bidomîne. KCK'ê di daxuyaniya xwe de got "Cara yekem e ku pirsgirêka kurd di hawira bêpevçûn de ketiye pêvajoya çareseriyê". KCK'ê careke din destê aştiyê dirêjî dewleta Tirk kir.

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê di daxuyaniya xwe de got ku hilbijartinên li Kurdistanê ku ji aliyê her kesî ve bi awayekî baldar dihat şopandin xeta demokratîk a welatparêz bi ser ket û wiha got: "Li hundir û derve hemû derdorên siyasî û çapemeniyê destnîşankirin ku gelê kurd polîtîkayên dewletê û AKP'ê red kirine. Cara yekem e bi awayekî berfirehî hatiye destnîşankirin ku bêyî Rêber Apo, PKK û DTP pirsgirêk çareser nabe. Encamên hilbijartinê di raya giştî de bendewariya ku pirsgirêka kurd çareser bibe zêde kiriye."

KCK'ê ragihand ku ji aliyê gel ve erêkirina bernameya DTP'ê berpirsyarî ketiye ser milê wan û wiha hate gotin: "Bi awayekî aşkera derketiye holê ku ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê û pirsgirêka kurd divê bi rêbazên demokratîk bê çareserkirin.

KCK'ê, ragihand ku cara yekem e pêvajoya çareseriyê bêpevçûnê derketiye holê û wiha hatiye gotin: "Hilbijartinên 29'ê Adarê di nava hawireke bêçalakî û pevçûnê de di encama helwesta tevgera me de pêk hatiye. Cara yekem e fikra çareseriya bêpevçûn derketiye holê." KCK'ê daxuyand ku di demeke biryara dirêjkirina bêpevçûnê hate dayîn de artêşa tirk li Şirnex, Dêrsim hwd. destpêkirina operasyonan mirov dide fikirîn. Piştî hilbijartinên 29'ê Adarê ku di pêvajoyeke bendewarî û fersendên ji bo çareseriyeke siyasî û demokratîk derketine holê de, tu îzaha operasyonan tune ye.

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku heke êrîş pêk neyê dê biryara bêçalakatiyê bi biryardarî dê bidomînin û wiha hatiye gotin: "DTP di hilbijartinan de bi Nasnameya Azad, Serokatiya Azad û Xweseriya Demokratîk derket pêşberî gelê Kurdistanê, Tirkiye û raya giştî ya navneteweyî. Bi awayekî zelal hate dîtin ku ev proje ji aliyê gelê kurd ve hatiye erêkirin û daxwaza di qada siyasî ya demokratîk de bê pratîzekirin hatiye dîtin."

KCK'ê ji bo çareseriyeke aştiyane bangî hêzên navneteweyî kir û got ku di demeke nêz de projeyeke çareseriyê ya berfireh dê bi raya giştî re parve bikin.




*Koma Civakên Kurdistanê heta 1'ê hezîranê biryara bêpevçûnê daye. Li hemberî vê biryara KCK'ê li bakurê Kurdistanê sewqiyata leşkerî zêde bûne û li gelek deverên Kurdistanê operasyonên artêşa tirk zêde bûne.*

## Deng: Agirkujiya bi benzînê

tayiptemel@walla.com TAYÎP TEMEL

Gelê kurd di pêvajoyeke giran re derbas dibe. Li aliyekî li hemberî DTP'ê operasyoneke berfireh hate destpêkirin û li aliyê din zîhniyeta leşkeriyê ya nehatiye guhertin xwe ferz dike. Her wiha KCK'ê bi daxuyaniyekê destnîşan kir ku ji bo pirsgirêka kurd bi riyên aştiyane û diyalogê bê çareserkirin heta 1'ê hezîranê biryara bêpevçûnê da. Li hemberî vê biryarê li gelek deveran operasyonên leşkerî têne lidarxistin. Li aliyekî din jî pekutiyên li ser zimanê kurdî zêde dibin.

Tevgera Azadiya Kurdistanê ji bo pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk bê çareserkirin destê xwe yê aştiyê careke din dirêjî Tirkiyeyê kir. Lê wiha xuya dike di nava dewletê hin hêzên ku hêj çareseriyê naxwazin hene û ji bo berjewendiyên xwe dixwazin Tirkiyeyê ber bi kaosekê ve dahf bidin. Tirkiye divê ji şerê çekdarî ku heta niha hatiye jiyîn gelek ders derxistiba. Di nava kurdan de kurteçîrokek heye, tê gotin ku kerek dema ji cihekî derbas dibe û bûyereke nebaş bê serê wî, tu bikuje jî di heman cihî de cara duyem derbas nabe. Lê wisa xuya dike dewleta Tirkiyeyê ji şerê çekdarî ku heta niha hatiye jiyîn ders dernexistiye û dixwaze dîsa pirsgirêka kurd bi şîdetê çareser bike.

Di zîhniyeta leşkeriyê de tu guhartin çênebûye. Kengî ku Tevgera Azadiya Kurdistanê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd banga riyên demokratîk û aştiyane dike, dewleta tirk vê weke qelsiyê dinirxîne û êrîşên xwe zêde dike. Bi hatina biharê re li gelek deverên Kurdistanê operasyonên leşkerî berdewam dikin. Her wiha Serfermandarê Artêşa Tirk Îlker Başbûg her çiqas di vegotina xwe de zimanekî cuda bikaranîbe jî zîhniyetê de tu guhartin çênebûye. Di axaftina Başbûg de nîşaneyên ku operasyona der barê DTP'ê de hatiye meşandin heye "armanca têkoşîna bi terorê re ew e ku baweriya serkeftinê bi wan re bê tunekirin." Careke din aşkera bû ku artêş û AKP li hemberî gelê kurd milê xwe dane hev û konsepta bêîradebûnê li ser kurdan ferz dikin

Dewleta tirk dixwaze agir bi benzînê vemirîne. Li 13 bajaran li hemberî DTP'ê operasyoneke berfireh da destpêkirin. Ev operasyon li hemberî îradeya gelê kurd a azad e. Dixwazin kurdên li gorî xwe amade bikin û bi çewisandin, binçavkirin, îşkence û girtinan îradeya gelê kurd a azad teslîm bigirin. Bi van kirinên xwe gavan bi paşve bide avêtin. Lê gelê kurd wekî her tim çawa li hemberî polîtîkayên çewisandin, înkar û îmhayê li ber xwe dabe, dê dîsa van planan pûç derxin. Gelê kurd duh li gelek bajaran li siyasetmedar û zarokên xwe xwedî derket. Ev yek jî nîşan dide ku dê dîsa gelê kurd hemû polîtîkayên ku derveyî îradeya xwe ya azad pûç derxe.

Her wiha li ser weşanên kurdî jî pekutiyên dewletê zêde dibin. Naxwazin dengê çapemeniya azad bigihêje gelê kurd. Di warê zimanê kurdî de jî durûtiya dewletê didomê. Ji aliyekî TRT 6 vekiriye, behsa vekirina kursiyên kurdolojiyê dike. Lê ji aliyê din ve jî li Tirkiyeyê ku tekane rojnameya kurdî bi rojane derdikeve Azadiya Welat digire û her wiha ketiye nava hewldanan ku televîzyona kurdan ROJ TV bigire. Ev hewldanên li hemberî çapemeniya kurdî nîşan dide ku dewleta Tirkiyeyê bi biryarên xapînok -TRT6 û hewldanên li zanîngeha ji bo kursiyên kurdolojiyê- careke din gelê kurd bixapîne. Gelê kurd çawa li hemberî hemû zilm û zordariya li se wê xwedî li îradeya xwe ya azad derdikeve, dê wisa li çapemeniya xwe jî derkeve.

# Operasyon pêvajoyê sabote dikin!

## Dewleta Tirk, ligel helwesta KCK'ê û gelê kurd a ku pirsgirêka kurd bi riya diyalogê bê çareserkirin êrîş û operasyonan didomîne. Operasyonên ku li her deverê Kurdistanê hatiye destpêkirin pêvajoyê provoke dike

Li Kurdistanê bi hatina biharê operasyon her diçe zêde dibe. Di 2 hefteyên dawî de ligel biryara KCK'ê ya bêçalakiyê li gelek herêmên Kurdistanê operasyonên leşkerî yên Artêşa Tirk bênavber didomin.

Koma Civakên Kurdistanê (KCK) beriya hilbijartinên herêmî biryara bêçalakiyê girtibû. Piştî hilbjiartinan jî heta meha hilbijartinan jî ji bo ku pirsgirêka kurd bi riya diyalog û siyasî bê çareserkirin heta meha hezîranê ev biryara xwe ya bêçalakiyê dirêj kir. Lê piştî hilbijartinên herêmî Artêşa Tirk operasyonên leşkerî zêde kir. Bi taybetî li bakurê Kurdistanê ji Amed û Dêrsimê heta Colemêrgê operasyon bênavber didomin. Di hilbijartinên herêmî de DTP'ê serkeftineke girîng bi dest xist û 99 şaredariyên bajar, navçe û bajarokan qezenc kir. Ev serkeftina siyasî û helwesta gelê kurd nîqaşên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd jî zêde bûn. Bi taybetî ev encam ji bo vekirina riya diyalogê gaveke girîng hate nirxandin.

Lê ligel van nîqaş, nirxandin û nêrînan dewleta tirk li şûna ku riyên diyalogê vebike û vê rewşa êrênî weke fersendekê bibîne giraniyê dide operasyonên leşkerî. Artêşa Tirk li her devera bakurê Kurdistanê operasyonên leşkerî daye destpêkirin. Çiyayên Kurdistanê bombebaran dike. Li hemberî sivîlan jî terora xwe didomîne û qetlîaman pêk tîne.

Ligel biryara KCK'ê û daxwaza gelê kurd ev operasyon û qatlîamên dewletê yên li hemberî gelê kurd û gerîlayan weke provokasyonekê tê nirxandin.



**Sivîl hatin qetilkirin**

Dewleta Tirk piştî hilbijartinên herêmî cara ewil israra di şer de li gundê Amarayê nîşan da. Girseya ku ji bo rojbûna Rêberê Gelê Kurd xwest biçe gundê Amarayê rastî êrîşeke hovane hat. Di encama êrîşê de ciwanên bi navê Mahsûn Karaoglan û Mustafa Dag ji aliyê polîs û leşkeran ve hatin qatilkirin.

**2 Hefte ye operasyon didome**

Piştî hilbijartinên herêmî Artêşa Tirk li Amed û Çewlikê operasyon da destpêkirin. Li sêgoşeya Licê, Hênê û Darayeniyê operasyona ku Artêşa Tirk daye destpêkirin her ku diçe berfireh dibe. Helîkopterên leşkerî yên ku ji Licê û Darayeniyê radibin herêmê bombebaran dikin û leşkeran sewqî herêmê dikin. Herî zêde jî operasyon li herêma Koçwarê û Çeperê bi berfirehî didome. Gundiyên li herêmê ji ber operasyonê bi fikar in. Li gorî agahiyan li herêmê dem bi dem pevçûn jî diqewimin.

**Li Şemzînan û Besta…**

Li herêma Şemzînan û Bestayê jî Artêşa Tirk piştî hilbijartinan operasyon da destpêkirin. Operasyona li vir jî bêhtir li herêmên Begova, Şapata, Bêsosin, Bêdevê, Bembo û Musekayê didome. Operasyona ku di 9'ê mehê de dest pê kiribû hê jî didome.

Yek ji herêma ku Artêşa Tirk operasyon daye destpêkirin çoltera navçeya Çelê ya Colemêrgê ye. Helîkopterên skorsky ên ku ji 3'yemîn Fermandariya Tumen a Taktîk a Colemêrgê radibin diçin çoltera Çelê û herêmê hem bombebaran dikin û hem jî leşkeran dibin herêmê. Her wiha di heman demê de ji 20'emîn Fermandariya Tugay a Cendirmeyan jî balafirên şer herêmê bombebaran dikin.

**Li Mêrdînê sewqiyat**

Artêşa Tirk li herêma Mêrdînê jî amadekariya operasyona leşkerî dike. Bi taybetî jî ji navçeya Şemrexê ber bi herêmên Kurê Jor û Kurê Jêr sewqiyat tê kirin. Ji bo operasyonê tîmên taybet û leşkerên ku bi taybetî hatine perwerdekirin têne sewqkirin. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin ji bo operasyoneke berfireh li vir amadekarî tê kirin.

Li aliyê din di vê pêvajoyê de li herêma Cûdî û Bestayê jî amadekariya operasyonê tê kirin. Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên herêmî hatine bidestxistin li herêmê cerdevanên Sêgirkê jî ji bo operasyonê têne amadekirin.

Artêşa Tirk li Dêrsimê jî bi rojan e operesayoneke berfireh didomîne. Operasyon zêdetir li deverên Dokuzkayalar, Kutu Dere û Geliyê Mûnzûrê berfireh dibe. Hate ragihandin ku li hin cihan jî bi teyareyên Skorsky leşker tên bicihkirin û hind cihan pevçûn pêk tên.

**Windahiyên Artêşa Tirk**

Di operasyonên ku Artêşa Tirk daya destpêkirin de gelek windahî jî çêbû. Navenda Ragihandinê ya Hêzên Parastina Gel bi daxuyaniyekê aşkera kiribû ku di operasyonên herêma Colemêrgê de gerîlayên wan li hemberî Artêşa Tirk 4 çalakî li dar xistine û di encama van çalakiyan de 17 leşker hatine kuştin. Daxuyaniya Hêzên Parastina Gel wiha bû: "Di 6'ê mehê de gerîlayên me li hemberî leşkerên ku derketine operasyonê çalakiyek pêk aniye. Di encama çalakiyê de 4 leşkerên dijmin hatine kuştin û 2 leşker jî birîndar bûne. Di heman herêmê de gerîlayên me çalakiyeke duyemîn pêk anîne û li vir jî 5 leşker hatine kuştin, 4 leşker birîndar bûne. Di 7'ê mehê de li hemberî Artêşa Tirk ku xwestine lutkeya Şehîd Şiyar bi dest bixin 2 çalakî hatine lidarxistin. Di çalakiya yekemîn de 6 leşker hatine kuştin 2 leşker birîndar bûne. Di çalakiya duyemîn de jî 2 leşker hatine kuştin 4 leşker birîndar bûne."

Li aliyê din di operasyonan de li herêma Şirnexê 4 endamên HPG'ê jî di encama pevçûnan de jiyana xwe ji dest daye.

NAVENDA NÛÇEYAN AMED

# Piştgirî dan Azadiya Welat

MAZLÛMDER'a Amedê ji bo piştgiriyê navenda Azadiya Welat ziyaret kir.

MAZLÛMDER'a Amedê, Navenda Rojnameya Azadiya Welat ku weşana wê ji bo mehekê hatibû girtin, ziyaret kir. Serokê MAZLÛMDER'a Amedê Selehatîn Çoban û endamên komeleyê ji aliyê xebatkarên rojnameyê ve hatin pêşwazîkirin. Xebatkarên rojnameyê keyfxweşiya xwe ya ji ber serdanê anîn ziman.

**Êrîşî azadiya raman kirin**

Di serdanê de Serokê MAZLÛMDER'ê Selehattin Çoban jî girtina rojnameyê rexne kir û wiha got: "Li Tirkiyeyê tenê ji bo kesan demokrasî û hiqûq heye. Bi girtina rojnameyê êrîşa li ser azadiya fikr û ramanê pêk hatiye. Ol, reng, ziman û nijadê wan çi dibe bila bibe em piştgiriyê didin hemû mezlûman. Em dixwazin dawî li van êrîş û cezayan bê. Alîkariya ku ji destê me tê em ê bikin." **AMED**

# Kurdên enfalkirî hatin definkirin

Ji bo 187 kurdên hatibûn enfalkirin û hestiyên wan hatibûn peydakirin li Hewlêrê merasîmek hate lidarxistin. Piştî merasîmê hestiyên kurdên enfalkirî ber bi Germiyanê ve hatin rêkirin. Hestî dê di salvegera roja destpêka enfala li Kurdistanê hatibû destpêkirin de li Germiyana Herêma Federal a Kurdistana Federal hatin definkirin.

Êşa bi sed hezaran kurdên di dema rejima Baasê de hatibûn qetilkirin, berdewam dike. Piştî Rejîma Baasê hilweşiya hestiyên kurdên hatine enfalkirin jî tên derxistin. Li Goristana Al Heyderiye ya bajarê Necefê jî di encama lêkolînê de 187 hestiyên aydê kurdên herêma Germiyana Silêmaniyê hatibûn dîtin. Piştî dîtina van hestiyan rayedarên Herêma Federal a Kurdistanê di 20'ê kanûna sala 2008'an de bi balefirê hestî anîn Hewlêrê.

Wê demê ji bo anîna hestiyan bi beşdariya Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, Serokwezîrê Herêmê Nêçîrvan Barzanî, nûnerên partiyên siyasî û nûnerên dewletên wekî Amerîka, Îngîlistan, Rûsya, Îran, Fransa merasîmek hatibû lidarxistin. Îro jî ji bo hestiyên 187 kurdên hatibûn enfalkirin li Hewlêrê merasîmek hate lidarxistin. Hestiyên 187 kesan di çarçoveya merasîmê de bi konvoyekê li ber Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistanê û Lijneya Wezîran a Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistan hatin derbaskirin. Hestî piştî merasîmê bi riya bejayî ji herêma Gerimiyanê re hatin şandin. Hestiyên 187 kurdên hatine kuştin di 14'ê nîsana 2009'an de li salvegera roja Enfala li Kurdistanê dê li Kelar û Kifrî ya bi ser Germiyanê bêne definkirin.

**HEWLÊR**



Wêne: Mazlûm OZDEMÎR

# Malbata gerîlayê HPG'ê çû Şirnexê

*MÛŞ* - Malbata Nazir Aydin ku yek ji 10 gerîlayên HPG'ê di sala 2007'an de li çoltera navçeya Qilaban a Şirnexê di encama peçûnê de jiyana xwe ji dest dane, ji bo girtina cenaze çû Şirnexê. Malbata Nasir Aydin (Îsyan Brûsk) ku yek ji 10 gerîlayê HPG'ê di 23'yê tebaxa 2007'an de li çoltera navçeya Qilaban a Şirnexê di encama pevçûnê de jiyana xwe ji dest dane piştî encama testa DNA'yê ji bo girtina cenaze ji navçeya Gimgimê ya Mûşê çû Şirnexê. Heke malbat cenazeyê Nasir Aydin bigire dê li gundê Qerqerûta bi ser Gimgimê defin bike.

# Li Sûriyeyê ceza dan 7 kurdan

*ŞAM* - Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Sûriyeyê 2 jê jin li 7 kurdan bi îdiaya endamê PKK'ê ne ceza barand. Rêxistina Mafê Mirovan a Sûriyeyê ragihand ku dadgehê heta 7 salan cezayê girtîgehê da 7 kesên girtî. Li gorî daxuyaniya hatiye dayin, Dadgeha Ewlekariyê ya Sûriyeyê li Şamê der barê kurdên bi navê Muhammed Habeş Reşo û Îbrahim Şêxo bi 7 sal girtîgehê ceza kir. Dîsa kurdên bi navê Salih Misto bin Muhammed, Nurî Mustafa Huseyîn, Raşîd Îbrahîm Binaf bi 6 sal girtîgehê hatin cezakirin. Jinên bi navê Zeynep Muhammed Horo û Latîfe Muhammed Mînan jî bi 5 sal girtîgehê hate cezakirin. Di 5'ê nîsanê de jî heman dadgehê li 12 kesên ku 5 jê kurd bûn cezayên giran ên girtîgehê birîbû. Dadgeh piraniya cezayên xwe dispêrin xalên qanûnê yên mîna, "parçekirina axa welat" û "Hewldana xirakirina aramiya welat". Serokê Rêxistina Mafê Mirovan Ammar Qurabî ragihand ku dadgeh bi rengekî kêfî ceza li mirovan dibirin.

# Navenda cinayetên kiryar nediyar nayê lêkolînkirin

Navçeya Farqîna Amedê di salên 1990-1997'an de bi cinayetên kiryarên wan nediyar her tim di rojevê de bûn. Li navenda navçeyê û gundên wê ji 850'an zêdetir kes hatin qetilkirin. Lê heta niha ji bo dîtina cenazeyan tu tişt nehat kirin.

Li Farqînê carna 3, carna 5 kes dema ku li cadeyan dimeşiya an jî diçûn mal û kargehên xwe rastî êrîşan dihatin û dihatin qetilkirin. Carna jî jinên ku serê wan vekirine û şal (pantolon) li xwe kirine rastî êrîşên bi sator dihatin û di encama êrîşan de jiyana xwe ji dest didan. Her wiha ji gelek kesan careke din agahî nehat girtin. Bi vî rengî li Farqînê, Hîzbî Kontra û JÎTEM'ê bi salan gel di qatlîamê re derbas kir. Kolanên Farqînê di nava xwînê de hîştin. Meleyên ku cenaze dişûştin û kesên ku diçûn sersaxiyê jî hatin qatilkirin. Farqîn kirin dojeh.

Wê demê bi dehan kesên ku ji aliyê Hizbûllahê re hatin revandin li gundê Sûsa hatin girtin. Hizbûllahê gund kiribû îşkencexane. Lê ligel ku evqas sal derbas bû li gund tu lêkolîn nehat kirin. Bi salan e tê gotin ku Hizbûllah kesên ku qetil kirine li maleke 3 qatî ya li ser cadeya Azîzoglu ya ku li başûrê keleha Farqînê ye veşartiye. Lê ligel vê yekê jî tiştek nayê kirin.

EMÎR EMÎRXAN AMED / ANF

# ‘Pêvajoya aştiyane tê sabotekirin’

**Koma Civakên Kurdistanê operasyonên pêr ên dewleta tirk, wekî êrîşeke li hemberî îradeya gelê kurd û sabotekirina hewldanên çareseriya demokratîk nirxandin. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku pêvajoya aştiyane tê sabotekirin**

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi zimanekî tund êrîşên dewleta tirk pêr li hemberî buroya parêzerên Ocalan, DTP û saziyên kurd pêk anîn, şermezar kirin.

KCK'ê bi bîr xist ku AKP'ê di hilbijartinên herêmî de gelek deng winda kirine, DTP'ê serkeftineke girîng bi dest xistiye û fersenda çareseriya demokratîk derxistiye holê û got: “Lê belê dewleta tirk û hikûmeta AKP'ê di cihê bikaranîna vê fersendê de, li Agirî û Amarayê êrîş kirine, 2 ciwan kuştin, bi dehan kes birîndar kirine û bi dehan kes jî girtine û bi vê yekê bêtehamuliya xwe nîşan daye.”

KCK'ê da zanîn ku AKP û dewleta tirk tevî êrîşên li dijî gel ên piştî hilbijartinan, li Şirnex, Amed, Dêrsim û Colemêrgê jî, dest bi operasyonên tunekirinê yên li dijî gerîla kirine û got: “Gelê kurd ji bo nasnameya azad û çareseriya demokratîk dengê xwe da DTP'ê û bingeha diyalogê derxist holê. Me jî ev daxwaz û bendewariyên gelê kurd li ber çavan girtin û heta 1'ê hezîranê biryara bêçalakîtiya eskerî direj kir û banga çareseriya demokratîk û diyalogê li rêveberiya tirk kir.”

**‘Başbûg peyama îmhayê daye’**

Serokatiya Konseya Rêveber anî ziman ku dema ew li benda bersiveke erênî bûn de, dewleta tirk bi berfirehkirina operasyonan û şîdetê bersiv daye û got: “Dema ku Serfermandarê Tirk Îlker Başbûg peyama şîdeta li hemberî gerîla dida, li gelek bajêr û navçeyan li hemberî DTP'ê êrîş pêk hatin. Gelek rêveberên partiyên hatin binçavkirin. Di heman çarçoveyê de, li hemberî parêzerên Rêber APO jî operasyon pêk hat û 3 parêzer hatin binçavkirin.”

KCK'ê êrîş û operasyonên li hemberî DTP'ê û saziyên kurd, wekî êrîşeke li hemberî îradeya gelê kurd nirxand û got: “Van êrîşan careke din nîşan da ku, AKP encama hilbijartinan rast fêm nekiriye û bi Serfermandariyê re di nava hevkariyê de ye. Ev êrîş û operasyon li hemberî îradeya gelê kurd in. Armanca wan jî, derfetên çareseriya demokratîk û aştiyê ku cara yekemîn e bi vî rengî derketine holê, sabotekirin û xerakirina moralê gelê kurd û DTP'ê ye.”

KCK'ê reaksiyona tund nîşanê îdiayên wekî rêveberên DTP'ê yên hatine binçavkirin, endamên PKK'ê da û got: “Ji kesên biçavkirî, tu kes ne endamên PKK'ê ne. Ev îdiayên ji bo amadekirina bingeha girtin û rewa nîşandana êrîşan in.”

**Hewldanên sabotekirinê**

Serokatiya Konseya Rêveber banga dawî li êrîş û hewldanên sabotekirina pêvajoya aştî û çareseriya demokratîk bîne, li rêveberiya tirk kir û got: “Heke ev êrîş û operasyon dewam bikin, dê pêvajoyeke xeternak dest pê bike. Me wekî tevgera azadiyê, ji bo çareseriyê gava yekemîn avêt û li benda bersiveke erênî ne. Bi derewan girtina siyasetmedarên kurd û krîmînalîzekirina welatperwerên kurd, ji bilî xurtkirina pirsgirêkê xizmetê tu tiştî nakin û ev pêkanîn wê rê li ber talûkeyên ku tu kes nikare ji bin rizgar bibe, vekin'.

**Banga xurtkirina têkoşînê**

KCK'ê ji AKP û Artêşa Tirk xwest ku dev ji pêvajoya xeternak berde, bi hurmet nêzî encama hilbijartinê bibe û ji bo çareseriya demokratîk jî gavên pêwist biavêje. KCK'ê banga piştgiriyê li hêzên demokratîk ên Tirkiyeyê kir û ji gelê kurd jî xwest ku li hemberî êrîşan bêdeng nemîne, êrîşên li hemberî nûnerên xwe şermezar bike û têkoşîna azadiyê jî xurtir bike. BEHDÎNAN / ANF



# ‘Li dîroka Şêx Seîd û Mazlum Doganan binêrin’

Operasyona li dijî DTPê li Amedê bi meşek beşdariya 10 hezar kesî hate şermezarkirin. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr di daxuyaniyê de bang li hikûmetê kir û xwest ku dest ji şer û polîtîkayên kuştinê berde. Wekîlê Serokê Koma DTP'ê Selahattîn Demîrtaş jî xwest di zûtirîn demê de hevalên wan serbest bên berdan û bi gotina, "Bi agir nelîzin. Sebra gelê kurd xilas nekin" AKP hişyar kir.

Serokê Rêxistina DTP'ê ya Amedê Alî Şîmşek, Parlamenterê DEP'ê yê berê Hatîp Dîcle, parlamenterên DTP'ê Selahattîn Demîrtaş, Sabahat Tuncel, Ayla Akat Ata, Gultan Kişanak, Aysel Tugluk, Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr û şaredarên DTP'î jî di nav de bi hezaran kes li Amedê meşiyan. Bi hezaran kes ji vir ber bi Parqa Koşuyoluyê ve dest bi meşê kir. Di meşê de slogana, "PKK gel e gel li vir e" derket pêş.

Li Parqa Koşuyoluyê daxuyanî hate dayîn. Serokê DTP'ê ya Amedê Alî Şîmşek diyar kir ku gel bersiva êrîşa li ser partiya wan daye û ev tişt gotin: "Em dê heta dawiyê li ber xwe bidin. Yekitiya gelê me li hemberî yên van êrîşan pêk tînin, bersiva herî baş e."

**'Bila li dîroka kurdan binêrin'**

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî gel silav kir û wiha domand: "Bila her kes şîreta vî gelî bike guhar û bixe guhên xwe. Ev gel bi girtin û binçavkirinan ji doza xwe venagere. Ev gel bi kuştinê ji baweriya xwe venagere. Yên naxwazin li dîroka aştiyê binêrin bila li dîroka Şêx Seîd heta Mazlum Dogan binêrin."

Wekîlê Serokê Koma DTP'ê Selahattîn Demîrtaş jî, diyar kir ku dema derî dihatin şikandin û DTP'yî dihatin binçavkirin Serfermandarê Giştî Îlker Başbug hincetên operasyona li dijî DTP'ê vedigot û wiha dom kir: "Kesên li sedemên operasyona li dijî DTP'ê digerin bila li daxuyaniyên Serfermandarê Giştî yên di heman saetan de hatin dayîn binêrin. Ev yek îfadeya fermî ya operasyona li hemberî DTP'ê hate lidarxistin bû. Ev operasyon ji bo şikandina îradeya gel hate pêkanîn. Lê gelê kurd dê destûrê nede ku hûn wan rojên reş dîsa bidin jiyîn. Gel di hilbijartina 29'ê adarê de vîna xwe derxist holê. Hêviya vî gelî ew e ku hûn li hemberî vê îradeyê rêzê nîşan bidin. Plana tunekirinê ya berî hilbijartinan û piştî hilbijartinan hate amadekirin tevî vê vîna bi hêz dest pê kiriye." AMED / DÎHA

# 'Êrîşa li dijî DTP'ê li dijî demokrasiyê ye'

Akademîsyen û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl ku li dijî operasyona di heman demê de li 15 bajaran li hemberî DTP'ê hate pêkanîn nerazîbûn nîşan dan, dan zanîn operasyona pêk hatiye li dijî demokrasiyê ye.

**Sekreterê Giştî yê TÎHV'ê Metîn Bakkalci:** Gel di rewşeke demokratîk de, li gorî demokrasiyê û qenalên siyasî, bi şikleki hemû kes fêm bike vîna xwe diyar kir. Rewş evqasî zelal bû. Li gorî vê rewşê pêwîst bû li welat riyên demokratîk hîn zêdetir bihatana vekirin. Vê rewşê ji bo îro û pêşerojê fikareke mezin derxistiye holê. Astengkirina bi mîlyonan mirovan a ber bi qenala siyasî rewşeke xetere ye.

**Ji sekreteryaya Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Îmam Canpolat:** Ev helwest xizmetê nade aştiya civakî. Li şûna ku piştî daxuyaniya KCK'ê di nava raya giştî de dengê aştiyê bilind bibûna, ev nêzîkatiya dibe ku bibe wesîleya pevçûnan dê ji bo Tirkiyeyê ne bi xêr be." Canpolat, li hemberî gotina ev 2 sal in taqîba teknîk pêk tê ya serdozgeriyê nerazîbûn nîşan da û wiha pê de çû: "Madem ev 2 sal in taqîba teknîk dibe, ji bo çi berî niha ev binçavkirin nebûn, lê piştî daxuyaniya KCK'ê bi rojekê pêk hatin. Ev operasyon ji bo terorîzekirina DTP'ê û bi lez derxistina wê ya ji qada demokratîk e. Ligel vê yekê daxuyaniya Cemîl Çîçek jî ji bo vê operasyonê tesîreke mezin pêk anî. Li gorî min sedema herî girîng jî piştî banga aştiyê ya KCK'ê pêk hat. Ez hêvîdar im ji vê xetayê veger bibe û pêkanînên bibin wesîleya aştiya civakî bên pêşxistin.

**Hîndekarê Zanîngeha Dîcleyê Doç. Dr. Vehap Coşkun:** Ev operasyona ku piştî hilbijartinê pêk hatî wadedar e. Piştî DTP'ê di hilbijartinê de serkeft, tê xwestin ku derxin derveyî qada siyasetê. Ev nêrîn pir talûke ye. Divê pêvajo bi awayekî hiqûqî dom bike. Her wiha pêwîst e bi awayekî zelal bidome. Fikara min heye ku tabloyek xirab û talûke derkeve holê. DTP dibêje ‘serkeftina me hezm nekirin. Ger ku pêşiya van nerînan neyê birîn dibe ku di pêvajoya pêş de bûyerên nexweş derkevin holê.

**Sekretera Giştî ya KESK'ê Songul Morsumbul:** AKP li şûna çareseriyê û demokratîkbûnê ber bi polîtîkayên înkar û tunekirinê dimeşîne. Divê hêzên aştî û demokrasiyê li hemberî van êrîşan bêdeng nemînin. Ji ber ku em bawer dikin ku pirsgirêk bi êrîş û hilandinê çareser nabe. Piştî hilbijartinê DTP bi ser ket. Ev van êrîşan wekî netehamulkirina li ser sereftina DTP'ê dinirxînin.

**Sekreterê Giştî yê Komeleya Çandê ya Pîr Sûltan Abdal Kemal Bulbul:** Di saetên ku Serfermandarê Artêşê daxuyanî da de li hemberî DTPê operasyon pêk hat. Ev rewşeke balkêş e. Em dixwazin ev rewş bê rastkirin û kesên hatine binçavkirin serbest bêne berdan.

**Serokê Giştî yê KESK'ê Samî Evren:** Tê dîtin ku hîn jî AKP'ê hêviya xwe ji pevçûnan û gengaşiyan nebiriye. Lê 10 salên li paş man nîşan da ku ev polîtîka tê wateya rijandina xwînê, êşê, rondikên çavan û xirabûna civakî-aborî. ENQERE / DÎHA

# Operasyona li dijî DTP'ê li gelek bajaran hate şermezarkirin

Operasyona li dijî DTP'ê li 15 bajaran hevdemî pêk hatî li Erzincan, Mêrdîn, Êlih, Dêrsim, Semsûr, Riha, Şirnexê, Wan, Mûş, Enqere, Çanakkale, Aydin, Bursa, Stenbol, Îzmîr û bi dehan bajar û navçeyên din hate şermezarkirin. Polîsên mudaxeleyê daxuyaniya li navçeya Dêrika Mêrdînê kir, 10 kes hildan binçavan.

**Li Kurdistanê çalakî**

Di daxuyaniya li ber avahiya DTP'ê ya bajar pêk hatî de şaredarên DTP'ê, rêveber û serokên navçe, bajarok û bajaran jî di nav de bi sedan kesî beşdarî daxuyaniyê bûn. Di daxuyaniya li ber avahiya DTP'a Sêrtê hate dayîn de Endamê PM'a DTP'ê Selîm Ozalp, Serokê DTP'a Sêrtê Abdurrahman Taşçi, Şaredarê Sêrtê Selîm Sadak û komeke qelebalix tevlî bûn. Di daxuyaniya li ber DTP'a Mêrdînê hate dayîn de Şaredarê Bajaroka Ewêna Fikrî Okmen, Şaredara Bajaroka Barman Gulbeyaz Guneş, Şaredarê Bajaroka Elfan Abdulkadîr Dag jî di nav de gelek kes amade bûn. Li ber Abîdeya Mafên Mirovan a li Kolana Gulîstan a Êlihê jî daxuyanî hate dayîn. Parlamenterê DTP'ê yê Êlihê Bengî Yildiz, Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay, Şaredarê Kercewsê Esat Uner, Şaredarê Hezo Raşît Haşîmî, Serokê DTP'a Êlihê Ozcan Erdem jî di nav de gelek kes tevlî daxuyaniyê bûn. Parlamenterê DTP'ê yê Êlihê Bengî Yildiz jî, diyar kir ku ji ber hikûmeta AKP'ê serkeftina wan hezim nekiriye li gelek bajaran operasyon daye destpêkirin.

Bi sedan kesên li ber avahiya DTP'ê ya Wanê hatin cem hev heta Kuçeya Hunerê meşiyan. Parlamenterê DTP'ê Ozdal Uçer, Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, Serokê DTP'a Wanê Selîm Ertaş, Şaredara Sixkeyê Nezahat Erguneş, endamên meclisa şaredariyê û meclisa giştî ya bajar ên DTP'ê û bi sedan kes beşdarî daxuyaniyê bûn. Li Qerqeliyê û Erdîşê jî çalakiyên li hemberî operasyonê pêk hatin. Li Colemêrgê û navçeyên wê Gever û Şemzînan jî DTP'ê operasyon şermezar kir. Her wiha li Mûşê û navçeyên wê Kop û Gimgimê jî çalakî pêk hatin. Li Îdir, Dêrsim, Erzirom, Semsûr, Riha û Erzîngan jî çalakî pêk hatin.

**Li Metropolan çalakî**

Her wiha li bajarên Tirkiyeyê yên wekî Aydin, Îzmîr, Stenbol, Bursa, Enqere, Antalya Manîsa, Mêrsîn, Çanakkaleyê daxuyaniyan girseyî hatin dayîn. Di çalakiyan de ligel DTP'iyan ODP, SDP, EMEP, Partîzan û Platforma Şaxên KESK'ê û gelek saziyên din ên sivîl beşdarî çalakiyan bûn.

**Li Mexmûrê çalakî**

Meclîsa Gel a Demokratîk a Mexmûrê bi daxuyaniyeke nivîskî operasyona li hemberî DTP'ê şermezar kir. Di daxuyaniyê de ev tişt hatin gotin: "Gelê kurd heta bigihêje azadiya xwe tu carî ji riya azadiyê venagere. Em wekî gelê Mexmûrê ji ber zilm û zora dewleta tirk koçber bûne, van êrîşan bi tundî şermezar dikin û diyar dikin ku her dem em piştgiriyê didin partiya gel DTP'ê." AMED / DÎHA

www.arsivakurdi.org



# 'AKP naxwaze rê li ber çareseriyê vebe'

**Operasyona li hemberî rêveber û endamên DTP'ê ya ku pêr pêk hatî bi tundî hate şermezarkirin. Meclîsa Aştiyê ya Ewropayê bi daxuyaniyeke nivîskî operasyon şermezar kir û nerazîbûna xwe diyar kir**

Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê têkildarî operasyona li hemberî DTP'ê daxuyaniyek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku li 13 bajaran bi hevdemî operasyon pêk hatiye û di encamê de zêdeyî 70 endamên DTP'ê hatine binçavkirin. Di daxuyaniyê de hate derbirîn ku li gorî operasyonên pêk hatîn, derketiye holê ku ev operasyon ji jor ve hatiye amadekirin û biryar berê hatiye dayîn.

**Wateya operasyonê...**

Di daxuyaniya Meclisa Aştiyê de hate derbirîn ku operasyona binçavkirinê li hemberî serkeftina DTP'ê ya hilbijartinê û biryara PKK'ê ya bêçalaktiyê pêk hatiye û ev tişt hatin gotin: "Ev operasyona polîsan a hovane ya li hemberî partiyek koma wê li parlamentoyê heyî û li ser bingeheke zagonî xebatê dimeşîne hêviya aştiyê ji holê radike. Armanca operasyonê kûrkirina şer e û talûkeya provokasyonê bi xwe re aniye. Tê xwestin ku bi riya polîsan pêşiya DTP'ê bê birîn. Ev bêedebiya li hemberî DTP'ê di heman demê de wekî nîşaneya planeke tarî û qirêj e."

**'AKP berpirsyar e'**

Daxuyaniyê bal kişand ser berpirsyariya AKP'ê ya di vê mijarê de û wiha domand: "Lazim e di serî de hikûmet û hemû derdorên berpirsyar ji bo rawestandina vê operasyonê û di zûtirîn demê de serbestberdana berpirsyarên partiyê tişta dikeve ser milê wan bikin. Em bang li hemû derdorên alîgirên demokrasiyê dikin ku piştgiriyê bidin DTP'ê û li dijî van êrîşan derkevin. Em wekî Meclisa Aştiyê ya Ewropayê van êrîşan şermezar dikin."

Di daxuyaniyê de biryara bêçalaktiyê ya PKK'ê jî hate bibîrxistin û wiha hate gotin: "Ji bo di çareseriya pirsgirêka kurd de pevçûn rawestin û riya diyalogê vebe, em biryara bêçalaktiyê di cih de dibînin û piştgiriyê didinê. Ji bo ev biryar bêdem bibe lazim e her kes hewl bide. Lazim e bi tevahî aliyê tirk vê carê destê aştiyê bigire." AMED / DÎHA

# Ji DTP'a Enqereyê şermezarkirin

DTP'a Enqereyê operasyona li dijî partiya xwe şermezar kir. Serokê DTP'a Enqereyê Îsmaîl Anci bal kişand ser biryara bêçalaktiyê ya PKK'ê û axaftina Serfermandarê Giştî Îlker Başbug û diyar kir ku ev pêşveçûn wan dixin nav fikaran.

Di daxuyaniya li avahiya DTP'ê ya bajar pêk hatî de ESP, SDP, EHP, SP, Komeleya Hevgirî û Yekitiya 78'an û gelek saziyên din jî bi armanca piştgiriyê amade bûn. Serokê DTP'a Enqereyê Îsmaîl Anci bal kişand ser biryara bêçalaktiyê ya PKK'ê û axaftina Serfermandarê Giştî Îlker Başbug û diyar kir ku ev pêşveçûn wan dixin nav fikaran. Anci wiha axivî: "Serkeftina DTP'ê hezm nekirine. Ev yek di dauyaniyên Serokwezîr Erdogan û Berdevkê Hikûmetê Cemîl Çiçek de pir zelal derketine holê. Binçavkirina DTP'yiyan ku cîgirên hevserokên me jî di nav de ne, xizmeta aştiyê nake. Di demek hêviyên aştiyê çêbûyîn de êrîşên li ser DTP'ê van hêviyan tune dikin. Kes nikare têkoşîna DTP'ê paşve bixe. Em dê têkoşîna xwe bilindtir bikin."

**'Dê pira biratiyê ava bikin'**

Berendama Şaredariya Enqereyê ya hêzên çepgir Kamîle Oncel jî diyar kir ku di dema hilbijartinê de rastî gelek êrîşan hatine û wiha domand: "Li hemberî ESP'ê jî heman êrîş pêk hatine. Ligel van tevan kedkaran li Enqereyê alternatîfek afirandine. Armanca me ew e ku di navbera Stenbol û Amedê de pira biratiya gelan bê avakirin. Bi têkoşîna kedkarên kurd û tirk dê çareserî bibe." ENQERE

# Li cerdevanên Kirorê cezayê hilbijartinê birîn

Li Şirnexê hate ragihandin ku bi boneya ji gundê Kirorê ya bi ser navçeya Qilabanê ji DTP'ê re zêde deng derketine, xizmeta tenduristiyê ya ji aliyê Tugaya Kirorê ve dihate dayîn hatiye birîn. Her wiha hate ragihandin ku leşker cerdevanên nexweş û hatine emeliyatkirin ji bo nobetê dişînin cihên dûr.

Hate ragihandin, ji ber ku di hilbijartinên herêmî yên 29'ê adarê hatine lidarxistin de ji DTP'ê re zêde deng derketine, li gundê Kirorê ya bi ser navçeya Qilabanê, xizmeta tenduristiyê ya ji aliyê Tabûra Kirorê ve dihate dayîn hatiye birîn. Bi boneya ku gund 30 kîlometreya ji navçeyê dûr e gundî zû bi zû ji bo tenduristiyê naçin, navenda navçeyê. Her wiha hate diyarkirin ku leşker cerdevanên nexweş û emeletkirî bi boneya nobetê bigirin dişînin cihên dûr. Cerdevanek ku nexwest navê xwe bide destnîşan kir ku ji bo leşkeran dixebitin lê ji aliyê leşkeran ve hatine mexdûrkirin. Cerdevan, got ku ji ber ji DTP'ê re zêde deng derketine leşkeran xizmeta tenduristiyê birîne. Cerdevanekî din jî diyar kir ku ji 700 dengan ji DTP'ê re 420 deng derketine û daxuyand, bi salan beriya niha di encama guleberdana leşkeran ji piyê xwe birîndar bûye. ŞIRNEX

# Ciwanan rê ji trafîkê re girt

**İZMÎR** - Li taxa Yamanlarê ya Karşiyakaya Îzmîrê ciwanan bi armanca şermezarkirina bûyerên Amarayê û operasyona li hemberî DTP'ê bi molotofkokteylan rê ji trafîkê re girtin. Li taxa Yamanlarê ya Karaşiyakayê ciwan li ber Mala Tenduristiyê ya Yamanlarê hatin cem hev û bi armanca şermezarkirina bûyerên Amara, Agirî û operasyona li hemberî li 13 bajaran bi heman demê hatiye destpêkirin meşek li dar xistin. Ciwanan di çalakiya xwe de sloganên wekî "Bijî Serok Apo", "Bê Serok jiyan nabe" û "AKP şaş nebe berê me nede çiyê". Piştî meşê ciwanan bi molotofkokteylan rê ji trafîkê re girtin.

# 2 rojên din jî di bin çavan de ne

**AMED** - Kesên di çarçoveya operasyona li hemberî DTP'ê li bajarên wekî Amed, Şirnex, Mêrdîn, Êlih, Dêrsim, Stenbol, Enqere, Aydin, Edene û bi tevahî li 15 bajaran hevdemî hatibû destpêkirin de hatin binçavkirin, anîn Amedê. Ji bo 51 kesên hatine binçavkirin 2 rojan dema binçavkirina zêde hate xwestin. Parêzaran duh bi miwekîlên xwe re hevdîtin pêk anîn. Bi daxwaza 2 rojan dema zêdekirina binçavkirinê dê DTP'î 4 rojan di bin çavan de bimînin.

# KONGRA GEL

## Çarşema Sor pîroz kir

Bi munasebeta Çarşema Sor ku ji bo bawariya Êzîdî tê wateya destpêka sala nû KONGRA GEL peyameke pîrozbahiyê weşand. Di peyamê de di serî de mîr, pîr, şêx û feqîrên laleşê Çarşema Sor li tevahiya civaka Êzîdî û gelê kurd hate pîrozkirin.

Di peyama xwe de KONGRA GEL bi bîr xist ku Çarşema Sor tê wateya ji nûve zindîbûna xwezayê û sala nû û wiha hate gotin: "Ev cejn bi hezaran salan e ku li Kurdistanê mîna destpêka sala nû tê pîrozkirin. Di roja me de jî civaka Êzîdî vê cejnê di heman wateyê de pîroz dike." KONGRA GEL careke din bi bîr xist ku cejn tên wateya rojên aştî, azadî û şahiyê û hêviyên xwe yên ku ev cejn jî bibe wesîleya aştiya civakî û azadiyê anîn ziman û banga pîrozkirina Çarşema Sor a li ser vê bingehê kir. BRUKSEL

# Rapora xebatê ya Şaredariya Wanê nehate qebûlkirin



Meclîsa Şaredariya Wanê, bi mebesta di rapora xebatên sala 2008'an a şaredariyê de bêusûlî heye qebûl nekir.

Civîna meclîsê ya meha nîsanê ya Şaredariya Wanê dom kir. Di civîna ku bi tevlêbûna Şaredar Bekîr Kaya hate lidarxistin de rapora xebatê ya sala 2008'an a Şaredariya AKP'î nehate qebûlkirin. Rapora xebatê ya mijara gotinê, bi hincetên firotina hin zeviyên aydî şaredariyê û kêmbûna agahiyên di hin belgeyan de nehate qebûlkirin. Bekîr Kaya ku piştî biryarê daxuyaniyeke kurt da, diyar kir ku piştî nirxandinê dê dîsa raporê di ber çavan re derbas bikin. Kaya, destnîşan kir ku di raporê de bêusûlî hene û anî ziman ku piştî tespîtkirina bêusûlî û kêmahiyên di raporê de dê serî li riyên zagonî bidin. WAN / DÎHA

# Demîrbaş dêr ziyaret kir

Şaredarê Sûrê Abdullah Demîrbaş Dêra Meryemayê û Keldanî ziyaret kirin.

Şaredarê Sûrê Abdullah Demîrbaş û heyetek pê re Qeşeyê Dêra Meryem Ana Yusuf Akbulut û Qeşeyê Dêra Keldanî Yusuf Karadiyê ziyaret kirin. Demîrbaş bi boneya piştgiriya di dema hilbijartinê de dayîn spasiya xwe ji qeşeyan kir. Qeşe Akbulut bi boneya serdanê keyfxweşiya xwe anî ziman û diyar kir ku dê piştgiriyê bidin hemû tiştên bedew. Demîrbaş diyar kir ku gelê kurd di van hilbijartinan de berpirsyariyeke mezin daye wan û wiha got: "Em dê li gorî van berpirsyariyan hewl bidin pirsgirêkên gelê xwe çareser bikin. Ji niha pê ve bi projeyên em bi cih bînin em dê xizmeta hemû beşên civakê bikin. Em dê hemû beşên civakê tev li rêveberiya şaredariyê bikin." AMED

www.arsivakurdi.org

# Iraq destûra baregehan dide Tirkiyeyê

**Piştî dîplomasiya di navbera Amerîka, Tirkiye û Iraqê de li hemberî PKK'ê hewldanên neyartiyê pêk tên. Cîgirê Serokomarê Iraqê bi daxuyaniyekê helwesta hikûmeta Iraqê ya ku dixwaze cihê avakirina baregehê bide Tirkiyeyê aşkera kir**



Cîgirê Serokomarê Iraqê Tariq El-Haşimî ragihand ku ew ê destûrê bidin Tirkiyeyê ku li ser axa Iraqê li dijî PKK'ê baregehên leşkerî ava bike.

Roja 7'ê nîsanê ajansa ANF'ê bi agahiyekê bal kişandibû ser vê mijarê û di agahiyê de dihat destnîşankirin ku Tirkiye li Diyanayê baregeha leşkerî ava dike. Balkêş e ku cihê vê baregeha ku amedekariya wê dikin nêzî Xakurk û Xinêrê ye. Li gorî agahiya ANF'ê ev baregeh li navbera Diyana û Sîdekayê tê avakirin.

Cîgirê Serokomarê Iraqê Tariq El-Haşimî ku ji televizyona El-Hurra ya navenda wê li DYA'yê re axivî. Di axaftinê de PKK mîna rêxistineke zirarê dide 'bejewendiyên neteweyî' yên Iraq û Tirkiyeyê binav kir û got: "Divê em destûr û derfetê bidin Tirkiyeyê da li herêmê baregehan ava bike." El Haşimî di peyama xwe de têkildarî mijarê ev tişt bilêv kirin: "Mîna Iraqê; an divê em bi xwe PKK'ê li vê herêmê biqedinîn, an em derfetê bidin ku Tirkiye baregehan ava bike da ku karibe li van çiyayan PKK'ê biqedîne. Divê em xwe nexapînin, bangên diyalogê tev di gotinê de dimînin. Ez dibêjim êdî dem hatiye ku em tev bi yek destî vî karî biqedînin." El-Haşîmî ragihand ku mekanîzmaya sêalî ya ji DYA, Tirkiye û Iraqê pêk tê jî li ser kar û xabatên xwe didomîne. Li ser agahiya ANF'ê ya hefteya borî ku digot 'artêşa tirk li herêma di navbera Diyana û Sîdekayê de her wiha li herêma nêzî Qendîlê li Ranyayê 2 baregehên nû ava dike di nav gelê kurd de bû sedema bertekên tund. Gelê kurd vê hevkariya li hemberî rêxistina xwe PKK'ê wekî hevkariyeke dijminane dibîne. Ji ber vê jî di nav gelê kurd de her diçe bertekên li dijî vê mezintir dibin. **BEXDA / ANF**

## Siya Talîban Îslamabadê ditirsîne

Mîlîtanên Talîban her diçe li Pakistanê dibin xwedî hêz û kontrola xwe berfireh dikin. Li Pakistanê, Dola Svat bi giştî di bin kontrola mîlîtanên Talîban de ye û ev kontrol her diçe cihên nû ji bin kontrola artêşa Pakistanê derdixe û dike bin kontrola xwe. Herî dawî 6 gundên stratejîk ên ku 100 km dûrî paytexta Pakistanê ne girt kontrola xwe.

Hikûmeta Pakistanê ferman da rayedarên Polîs da ku mudaxeleyî hêzên Talîban nekin. Talîban li her cihê ku diçê şerîat îlan dike.

**Riyên Îslamabadê birîn**

Agahî di rojnameya Daily Telegraph a Îngilistanê de hat weşandin. Di rojnameyê de hat gotin ku hikûmeta Pakistanê bi fikara agirbesta di nav hikûmet û berpirsên herêmê da hatî morkirin xira nebe destûr nedaye ku polîs mudaxeleyî mîlîtanên Talîban bike. Ligel ku 6 gundên nêzî Îslamabadê ji aliyê hêzên Talîban ve hatin bidestxistin û riya esasî ya ku diçe Îslamabatê hat birîn jî destûra mudaxeleyê ji aliyê hikûmetê ve nehat dayîn. Ev gund 100 Km nêzî paytexta Paksitan Îslamabadê ne.

Li gorî agahiyên ku polîsên herêmê didin, mîlîtanên Talîban diçin di her mizgeftî de propaganda dikin û banga beşdariya şerîetê û piştgiriya Talîban dikin.

**Desthilatiya Talîban**

Rayedarên hikûmetê hewl didin ku mîlîtan bi diyalogê ji herêmê derkevin. Lê ev daxwazên hikûmetê ji aliyê hêzên Talîban ve nehatin qebûlkirin û bi awayekî lezgîn dest bi xurtkirina kontrola herêmê kir. Her cihê ku dikeve destê Talîban rejîma şerîetê lê saz dibe û bi Dola Savatê ve girê dide.

Di agahiyê de tê gotin ku gundiyên 6 gundên ji aliyê mîlîtanên Talîban ve hatine bidestxistin, desthilatiya Talîban qebûl nakin û li hemberî wan dest bi şer kirine. Di vî şerî de 8 mîlîtanên Talîban û 13 gundî hatin kuştin. Gundî bi çekên hikûmetê li ber xwe didin.

**Hatin er Îslamabadê**

Ji ber fikarên dagirkirina Îslamabadê Artêşa Pakistanê ket rewşa alarmê. Sefaretxaneya Amerîkayê û hemû sefaretxaneyên biyanî hêzên xwe yên ewlehiyê ji hemû aliyan ve taqwiye kirin.

**Hikûmetê şerîet erê kir**

Di meha sibata borî de Serokomarê Pakistanê Asif Elî Zerdarî peymana di nav hêzên Talîban û rêveberiya eyaleta sînorê bakurrojava de mor kir. Di vê peymanê de erk û raye dide ku Talîban li herêma Dola Savatê rejîma şerîetê birêxistin bike. Roja duşema borî Meclîsa Neteweyî ya Pakistanê bi yekdengiyê peymana mijara gotine erê kir. Lê di raya giştî de dihat payîn ku Zerdarî vê biryarê mor neke. Lê ji ber zextan helwesteke wisa nîşan neda.

**Amerîka ne li benda morkirinê bû**

Berdevkê Qesra Spî Robert Gibbs di daxuyaniyê fikara xwe ya li hemberî peymanê wiha vegot: "Divê parlamentoya Pakistanê hiqûqa medenî û mafê mirovan li ber çav bigirta. Lê ji ber ku ev hesasiyet li ber çav nehat girtin em bi fikar in." **ÎSLAMABAD**

## 'Pêşmerge mafan binpê dikin'

Rêxistina Efûya Navneteweyî (AI) ragihand ku li başûrê Kurdistanê binpêkirinên mafên mirovan zêde ne û pêşmerge ji windakirina di binçav de, êrîşên li dijî rojnamegeran û îşkenceyê berpirs girtin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî (AI) ya navenda wê li Londonê ye ji ber binpêkirinên mafê mirovan Hikûmeta Herêma Kurdistanê rexne kir. Rêxistinê têkildarî binpêkirinên mafên mirovan ên li başûrê Kurdistanê raporek weşand. Rapora bi navê, "Hêvî û Tirk: Li Herêma Federal Kurdistana (Iraqê) Mafê Mirovan" a ji 51 rûpelî pêk tê di sala 2008'an de di encama hevdîtinên rû bi rû de hate amadekirin. Rapor balê dikişîne ku hêzên asayişê yên girêdayî Serokê Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî derveyî hiqûqê tevdigerin û erkên xwe xirab bi kar tînin. Li gorî raporê pêşmerge bi rengekî kêfî mirovan binçav dikin, ji bûyerên di bin çavan de îşkence û windakirina mirovan berpirs in.

Rêxistina Efûya Navnetewî di rapora xwe de aşkera dike ku li herêmê zext û binpêkirin bi rengekî zêde pêk tên. Her wiha hate diyarkirin ku li navendên binçavkirinê, ji lêdanê heta bi îşkenceya bi elektrîkê, daliqandin, falaqa û bêxewhiştinê gelek rêbazên îşkenceyê pêk tên.

Dîrektorê rêxistinê yê Maseya Afrîkaya Bakur Malcolm Smart ragihand ku li gorî tevahiya Iraqê herêma Kurdistanê ji bo bipêşxistina mafên mirovan derfet bi dest xistine û bi taybetî xwest zexta li ser jinan û astengiyên li pêşiya azadiya ramanê werin rakirin.

Di rapora AI de hate bibîrxistin ku bi sedan kesên bi salan bên darizandin di binçav de hatin hiştin, serbest hatin berdan û heta niha rêveberiya kurd nikariye erkên berfireh ên pêşmergeyan bisînor bike.

Malcolm Smart bang li Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir ku der barê hêzên leşkerî yên PDK û YNK'ê de gavên berbiçav biavêje û mercên ku pêşmerge jî karibin li hemberî qanûnan hesabê bidin biafirînin.

**Kuştinên bi navê namûsê**

Rêxistina Efûya Navnetewî di rapora xwe de cihekî berfireh ji cudakarî, zext û kuştina jinan a di bin navê namûsê pêk tê re jî veqetand.

Ji hikûmetê hate xwestin ji bo astengikirina dijwarî û cudakariya li ser jinan hewldanên xwe zêde bike.

Dîsa bi taybetî hat xwestin rê li kuştinên jinan ên bi navê namûsê bê girtin û jinên di bin zextê de werin parastin û kesên zextê dike werin darizandin.

Rêxistinê cezayê îdamê yê li Herêma Federal a Kurdistanê jî di raporê de anî rojevê û xwest ji bo rakirina vî cezayî serastkirinên qanûnî werin pêkanîn.

Yek ji aliyên girîng ên raporê jî zextên li ser çapemeniyê ne. Qetilkirina rojnamevan Soran Mama Hama hate bibîrxistin û hat xwestin ku berpirsên vê kuştinê werin dîtin û cezakirin.

Dîsa bang hate kirin ku bi giştî zextên li ser çapemeniyê ji holê werin rakirin û dawî li sansurê bê anîn. **LONDON / ANF**






Abdulmenaf Bozkuş (Xebat)
02.03.2002 / Dêrsim



Bedrî Bozkuş (Ferhat)
1999 Nisêbîn

**BÎRANÎN**

*Ji bo welatekî azad*
*Ji bo jiyaneke bi rûmet*
*Ji bo zarokên gul bi ken*
*Ji bo dayikên dest bi hine*
*Ji bo evîn û hezkirinê*
*Ji bo meşa we ya pîroz*
*SILAV*
*SILAV*

*"DARA AZADIYÊ BI XWÎN BI XWÊDAN Û BI HÊSIRÊN ÇAVAN TÊ AVDAN"*

**Li ser navê malbata wan Hasan Bozkuş û Hakki Bozkuş**


## Fermandarê El Qaîdeyê yê tirk hate kuştin

Li Dagistanê di encama operasyoneke çekdarî ya Artêşa Rûs de rêveberê payebilind ê El Qaîdeyê yê tirk hate kuştin.

Li ser mijarê hêzên ewlehiyê yên Rûsyayê daxuyanî dan. Di daxuyaniyê de tê gotin ku roja sêşemê li gundê Hasavyurta Dagistanê kesek di ancama lêkdaneke çekdarî de hate kuştin. Piştî lêkolîneke berfireh derketh holê ku kesê hatî kuştin welatiyekî Tirkiyeyê ye û navê wî jî Ziya Peçe ye. Ziya Peçe wek berpirsê Dagistanê yê El Qaîdeyê dihat zanîn.

Ajansa Rûs Înterfax diyar kir ku Peçe demeke dirêj e li herêma Dagistanê ji bo El Qaîdeyê dixebite. Herî zêde jî ji bo rêxistinên îslamî piştgiriya fînansê berhev dikir. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ligel Ziya Peçe welatiyekî Rûsyayê bi navê Elî Ozdenîrov jî heye. Ozdenîrov li Dagistanê kar û barên molatiyê dikir. Li gorî agahiyê du car çûye Tirkiyeyê û ji bo rêxistinên îslamî desteka madî aniye. **MOSKOW**

Rupel 7++++++:Layout 1 15.04.2009 13:42 Page 1



# Li welatên Ewropayê temsîla jinê kêm e

**Konseya Ewropayê aşkera kir ku ew di tevlikirina jinan a siyasetê de ji hedefên diyarkirî gelek li paş mane. Di parlamentoyên Ewropayê de rêjeya parlamenterên jin ji sedî 22 ye**



Konseya Ewropayê ku ji bo tevlibûna jinan a di siyasetê de zêde bike xebatê dimeşîne aşkera kir ku ew negihiştine hedefên ku wan diyar kirine. Konseyê ji bo ku zêdetir jin tevli siyasetê bibin li ser hev banga tevlibûna siyasetê li jinan dike.

Ji sala 2003'yan heta niha konsey hewl dide ku li welatên Ewropayê di meclis û serokatiyên siyasî de rêjeya tevlibûna jinan bigihîne rêjeya ji sedî 40'ê. Di heman salê de pêşniyarên ku hatine kirin ji aliyê 47 nûnerên welatan ve hatin qebûlkirin. Lê li gorî encaman projeya tevlêkirina jinan a ji bo polîtîkayê zêde di bin hedefa hatiye diyarkirin de ma.

**Bi tenê li 8 welatan...**

Ji bilî 8 welatên Ewropayê tu welat negihiştin armanca ji sedî 40. Li 5 welatan jî bi tu awayî jin di meclis û parlamentoyan de cih nagirin. Sekretera Giştî ya Konseya Ewropayê Terry Davis rapora pêşketinê nirxand û got ku ligel hin aliyên erênî jî dîsa di mijarê de pêşkeftin pir kêm û qels e. Davis rewşa heyî nirxand û wiha got: "Ev bêedaletî û qelsiyeke mezin e. Tevlibûna jinan li hemû parzemînan kêm e. Lê li welatên Ewropayê divê zêdetir be. Me tespît kir ku li welatên ku endamên Konseya Ewropayê ne ji sedî 28'ê wezîran jin in. Di meclisan de jî rewşeke bi heman rengî heye. Ev rêje jî ji sedî 22 ye. Di warê hiqûqê de jî ev rêje ji sedî 28 e. Balkêş e ku jin herî zêde di warê rêveberiyên herêmî û şaredariyan de aktîf in, lê ligel vê rewşê jî ev rêje bi tenê ji sedî 10 e."

**Li 5 welatan wezîrên jin tune ne**

Li gorî raporê beriya 5 salan ji her 5 wezîran, wezîrek jin bû. Lê li gorî îstatîstîkên niha ji her 4 wezîran, wezîrek jin e. Lê di kontrola Konseya Ewropayê de nayê diyarkirin û nirxandin ka wezîrên jin di kîjan qadê de xebatê dimeşînin. Ji ber ku zêdetir jin di warê kar û barên malbat û karên civakî yên klasîk de wezîrtiyê dikin. Li gorî Rayedara Konseya Ewropayê Johanna Nelles ev yek kêmasiyeke mezin e û wiha dibêje: "8 welat di warê kotaya ji sedî 40'ê de gihiştine armanca xwe. Ev welat; Fînlandiya, Îspanya, Awûstûrya û Swêd in. Her wiha Norwêç, Fransa, Swîsre û Belçîka jî di nav van welatan de ne. Li Almanyayê rêje ji sedî 37,5 e. Danîmarka û Îzlanda jî piştî Almanyayê tên. Lê li welatên wekî; Azerbaycan, Bosna Hersek, Monako, Karadag û Romanyayê tu wezîrên jin tune ne."

**Hedef ji sedî 40 e**

Bi tenê li du welatên ku endamê Konseya Ewropayê ne jin di asteke bilind de ne û ew jî Fîlandiya û Îrlanda ne. Serokên du dewletan jî jin in. Almanya û Ukraniya jî wekî endam dixwazin rêjeya xwe bilind bikin. Armanc ew e ku temsîliyeta jinan bibe ji sedî 40. Ji niha ve weke projeyeke pîlot û ku bûye weke nêrînekê, bi siyasetmedarên bisiûd ku dikarin bibin mînak û her wiha ji bo jinên ciwan perwerde der barê rêvebirî û rêbertiyê de bê dayîn.

Der barê projeyê de Johanna Nelles wisa dibeje: "Xebatên me wekî serkeftineke ku di çarçoveya fermî de dikare bê nirxandin in. Bi taybetî di nava partiyên siyasî de hedefa ji sedî 40 çiqas pêk hat û her wiha çima pêk hatiye, divê ev yek bê vekolîn. Heke ev hedef erênî be, pêkhatina wê û çawayina wê divê li ser bê rawestan."

**Îskandînavya mînak e**

Encamên balkêş ên di lêkolînên Bankeya Cîhanê û Foruma Aborî ya Cîhanê de derketine holê. Mînak; li welatên ku jin di nava siyaset û aboriyê de cih nagirin aboriya wan di asteke pir dijwar de ye. Karên rojane ku jin dikin di nava îstatîstîkên fermî de cih nagirin. Jinên ku li kal û pîran mêze dikin, rêncberiyê dikin an jî sewalkariyê dikin bêpare dixebitin. Michelle Akip di vî warî de welatên wekî mînakên neyênî; Çad, Yemen û Pakistan nîşan dide. Siudî Erebîstan ji ber ku dahatiyan bêedalet parve dike di nava van welatan de tê nirxandin. Welatên Îskandinavyayê, ji ber sîstema wan a aborî weke sîstemeke model tê diyarkirin. Ev welatên Îskandînavyayê di heman demê de weke welatên ku di warê wekheviya jinan de di asteke bilind de tên hesibandin. **BRUKSEL**

## Her êşa memikan ne ji pençeşêrê ye

Herî zêde jin ji ber giliya êşa memikan serî li doktoran didin. Pisporê Cerrahiya Giştî ya Nexweşxaneya Zanîngeha Yedîtepe Doç. Dr. Alp Demîrag, da zanîn ku ji ber qahwe, çay, cigarê, kola û bikaranîna xelet a memedankê êşa memikan zêde dibe. Ev nexweşî 'Mastalji' tê binavkirin. Demîrag, diyar kir ku gelek jin ji ber giliya êşa memikan serî li doktoran didin. Demirag, destnîşan kir ku êş bi 3 rêbazê derdikeve holê û wiha got: "Pêşî û piştî cilketinê (regl), ji bilî cilketinê û nexweşiyên girêdayî tevînekê derdikevin holê. Gelek jin ji ber fikara pençeşêrê serî li doktoran didin. Em li gorî temenê nexweşan testan çêdikin û li gorî vê dest bi tedawiyê dikin. Heke nexweş ji 40 salî meztir be bê mamografî û heke ji 40 salî biçûktir be ultrasonografî tê kişandin. Heke pirsgirêkeke pençeşêrê neyê dîtin tedawiya mastaljiyê tê kirin. Ji sedî 90 nexweş bersivê dide tedawiyê. Lê divê nexweş li xwarina xwe baldartir be. **STENBOL**


*Ji gelê me re*

SPASÎ

Gelê me di hilbijartinên herêmî yên 2009'an de vîna xwe da xuyakirin û ev yek bû sedema serkeftineke mezin. Em soz didin gelê xwe ku em ê li gorî hemû hêvî û daxwazên wan tevbigerin û her dem xizmetkarê gelê xwe bin.
Em ê bi kar û xebatên şarevaniyê û bêrawestan bibin bersiv ji bo hêviyên gelê xwe .

DTP

**Rêxistina DTP'ê ya Sêrtê**
**Şaredar Selîm Sadak**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**


## Nêrîna bêsînor

Mizgîn Ronak

### *Barê serfiraziyê*

Hozanê mezin Pablo Neruda, ji bo gelê kurd jî dixwîne niha van risteyên xwe: "Gel im ez bi tiliyan nayêm hijmartin /wek lîbên genim her tim şîn têm!" Lewre gelê me, çirûskên Zapê bi pêt û alawiyên Newrozê xemiland û gulên ji agir berê xwe dan meydanên hilbijatinê. Vîn û zanîna xwe ya li hember zordestiya hezar salan peyîtand li wê meydanê û gelek gelek helbest xwendin. Helbesta azadiyê xwend li Bircên Amedê bû wateya azadiya Antîk jî, nûjen û kurdewar jî. Helbesta yekîtiyê xwend bû destana yekîtiya zarokên çiya. Li hemberî tevî astengî û kemînan wek pêtên agir xwe gihand hev û mal bi mal, tax bi tax, navçe bi navçe û bajar bi bajar ronahî kir. Helbesta şiyariyê xwend, bi stêrkan re şiyar, bi rojê re geriya, bû tîrêj û bextewar bû bi ronahiya xwe. Helbesta wefadariyê xwend, lewre bersiva xebatên DTP'ê û tevahiya tekoşînê da, careke din jî peyîtand ku; li ku ked û dildarî hebe, 'ew' li wir e, li ku bi hevrebûn hebe, 'ew' li wir e. Ango çawa ku helwesta xwe li hember burokratîzm, sersarî, berjewandîparêzî, nankorî û nedildariyê da, îsal ya nirxên dijberê vana da û careke din xwe û têkoşerên xwe, xwe û têkoşîna xwe, xwe û serhildana hêviyên xwe, bîr û baweriyên xwe hembêz kir.

Helbesta Bîrên Botaşê xwend; yên tije hestî, yên tije çîrok, yên tije jan û berxwedan! Helbesta bi hezaran miriyên bêgor nemirên li şevên xeyalan, li berbangên dilan, helbesta hebûn û nebûnê.

Helbet her serfirazî sozdanek e. Gelê kurd bi vê serfiraziyê soz da xwe û şehîdên xwe, xwe û çiyayên xwe, xwe û Roja xwe! Lewre serfirazî destpêkek e û despêk riyek dirêj dixwaze. Her serfirazî dijberê rehawet û valahiyê ye ev serfirazî jî. Loma jî gelê kurd bi qasê ku ji dewlet û hezar rûreşiyên wê re got "na", ji rehawet, zexeltî û valahiyên xwe re jî, ji bêwateyiyan re jî got na! Divê ku ev 'na' bi taybetî ji hêla DTP'ê ve, bi giştî ji hêla me tevan ve baş bê xwendin û bi 'nayên' wiha delal were zexmkirin û xemilandin.

Her wiha em serhildana Agiriyê jî dibînin û bi sirûda Serhildana Agiriyê ya li 1930'yî silav dikin. "Hilbe Agirî, hilbe Agirî!" lewre Agirî jî tevlî serfiraziya Amedê bûye, Mûş, Çewlik û Bedlîs jî. Wekî ku me tevan jî dît van her çar bajaran jî xwe "rizgar kirine" (ji qewlê kak Îkram ve) li gel Mêrdînê! Gulên sor li xwe kirin, destên me tije bawerî kirin, dilê Amed û Wanê, Sêrt û Îdirê tije hêvî kirin. Lê xuya ye ku em hinek dereng çûne van bajarên xwe. Ger ku karwanê Serhed û Mêrdînê lezgîntir bi rê biketa dê ev her pênc bajar jî niha sergovendî bûna di vê mîhrîcana serfiraziyê de. Ango divê em hin stranên gazinê jî bi ser xwe de bixwînin. Çima me li wan bajaran jî, dewletê, rehawet û xefletê neavête daristana dîrokê? Me çi li ku kêm hişt kîjan deriyê xwe, li ku asê nekir ku gurên boz careke din jî karin bikevin wan bajarên me?

Belê, barê serfiraziyê jî giran e, ancax bi pirsên wek Bircên Amedê bilind û wek behra Wanê kûr dikarin bêne bersivandin. Û her serfrazî gulistanek e ku em baş av nedin û aşêf nekin, diçilmise, bê payîz xwe dikuje. Loma jî divê em hevoka li ser lêvên her çar parçeyên Kurdistanê ku dibêje "çavên me ronî!" baş biparêzin û nehêlin ku çavên me û welatê me, çavên bajar û gundên me, çavên çiya û zindaniyên me tarî bibe… Jixwe Avrêl e, her gul bi navê Amarayê vedibe. Qulingên kurdan difirin Xelfetiyê. Berê qulingan li zozanan e, lê li zozanên li Amarayê, li Amaraya deryayan. Lewre Avrêl e, Av bi rê ketina, dilezînin. Av, dilê me, hêvî û xeyala me ye, nasekine, dibe kanî, çem û gol û diçe Deryaya Marmarayê. Lewre Avrêl e, yekîtiya Newroz û nûbûnê ye û dizane ku serfirazî sozdan e, sozdan jî tekoşîna mezintir. Loma jî em dizanin ku em ê nesekinin, silav bidin gulên dilşahiya ji bo Bakur, her çar parçeyan mîhrîcana serfiraziya Adarê bigihînin hev û nema rê bidin gurên boz û cerdevanên wan. Û her du şehîdên Amarayê bi sond û hêrs bi bîr bînin, her tim bidin jiyîn.

Piştî gitina rojnameya Azadiya Welat bi rojekê, têkiliya min û nivîskarekî çêbû. Min got, Azadiya Welat hatiye girtin, tu nivîsekê nanivîsî? Bersiva wî dilê min dax da. Got; "ez nivîsên siyasî nanivîsim. Eger rewşenbîr daxuyaniyeke edebî û tenê li ser ziman bidin, ez ê îmze bikim."

Ez şev û rojekê li ser van gotinan rawestiyam. Sê meh in ku bê rawestan, her şev, herî hindik çar saetan, li ser romana xwe ya nû kar dikim. Lê piştî van gotinan, min karê şevê yê li ser romanê rawestand, tenê ponijîm û min jiyana çend nivîskar, dîrokzan û rewşenbîrên biyanî xwendin.

Îro jî, ez gihame vê armancê ku beşeke mezin ya nivîskar û rewşenbîrên kurd, hîna siyasetê nizanin, edebiyatê fêm nakin, şerê psîkolojîk tênagihijin, di wate û girîngiya şerê 30 salan de negihane û dewleta tirk nas nekirine. Bi kurdî em bêjin; di guhê gê de dijîn.

Obama, Tirkiyeyê wek "partnêrê stratejîk" îlan kir û hevkariya çarkûçkî li Bexdayê amade kir û vegeriya. Tirkiye li hemberî kurdan kete nava hewldanan. Di nava çarkûçka li dijî kurdan de, mixabin hêzên başûrê Kurdistanê jî hene. (Em hêvî dikin ku ne mina dîmenê li



Tûjik

MEDENÎ FERHO
medeniferho@hotmail.com

# Girtina Azadiya Welat

darî çavan be…)

Hemberî ku gelek ji rewşenbîrên tirk, Tirkiyeyê wek "partnêrê stratejîk" yên Amerîkayê nabînin, wek "maşika destê Amerîkayê" dinirxînin jî; ji bo kurdan her du dîtin jî, ji hev ne cuda ne. Berî her tiştî, Amerîka "dewleta hegemon" e, Tirkiye jî, "dewleta payendek" e… Yanî hevkar û maşika destê dewleta hegemon e. Lewre Obama, Tirkiye wek "dewleta model" bi nav kir. Ev jî girîngiya dewleta Tirkiyê ya ji bo Amerîkayê û pêkanîna siyasetên Amerîkayê li herêmê destnîşan dike.

Obama miroveki reşik e, lê dewşirme ye û xwedî mejiyekî spî ye. Bi mêjiyê spî, PKK'e û El Qaîdeyê di yek kefikê de nirxand. Ev tê wateya ku PKK ne tenê dijminê Amerîkayê, dijminê cîhanê tevî ye. Gelo Obama û stratejîstên Obama, nizanin ku El Qaîde, hêza xwe ji olê û baweriya îslama radîkal distîne? Belê!.. Obama jî misilman e û dizane. Lê, bi mejiyê xwe yê spî û wek misilmantiya diranê çerxa sîstema Amerîkayê diaxive.

Obama baş dizane ku PKK, bingeha xwe, hiş û ramanê xwe tenê ji kurdîtiyê, ji gelên Kurdistanê ku gelên cuda, olên cuda, mezhebên cuda hene û ji mirovahiyê, ji demokrasiya gel distîne.

Çawa çêdibe û kîjan hiş û "îzan" erê dike ku PKK û El Qaîde di yek kefikê de werin rûniştandin?

Gelo ew nivîskarê ku min nirxekî giranbuha didayê, bîra van tiştan nabe? Helbet dibe… Dibîne, dirame… Lêêê tiştekî din heye, gelo çi ye? Li gorî xwe çend tiştan bêjim, "yan projeyeke wî li Tirkiyeyê heye, yan bêziraviyan dike, yan jî payeyekê dide xwe, kiras û xeftanekî cuda li xwe dike û bêyî bizanibe destekê dide siyaseta tirk". Yanî di "guhê gê de dijî"… Tirkiyeyê jî baş nas dike. Baş dibîne, dizane ku Tirkiye di pêvajoya nû de, berê xwe daye başûrê Kurdistanê, siyaseteke nerm, dûr û kûr kiriye rojevê. Ev siyaset jî, ji aliyê stratejîstên Obama ve hatiye amadekirin.

Armanca dewleta tirk, tesfiyekirina PKK'ê ye, têkbirina kurdên Bakur û destketiyên wan e. Erê û dewşirmekirina kurdên Başûr e… Dagirkeriya spî kiriye pratîkê. Ji aliyekî ve derbeya himandî, yanî "şûrê demokles" di ser serê wan re bigire, ji aliyê din ve dagirkeriya spî ya dewşirmetiyê wê bide meşandin. Wiha xuya dike ku rewşenbîr û nivîskarê me, çîroka mirîşkê û "temir temir" nizane.

Ez bêjim: "Mirîşkê digirin, serê wê dikine bin çengê wê û destê xwe hêdî hêdî lêdidin û dibêjin, "temir temir, bavê te mir, dayika te mir, birayê te mir, eger tu dengê xwe bikî tê bimir."

Gelo, pêdiviya şîrovekirina vê gotinê heye? Tirk vê siyasetê dimeşînin. Hêvî dikim ku nivîskarên kurd nekevin vê helwesta wêranzarî.

Armanca dewleta tirk ew bû ku navbera kurdan û Amerîkayê, navbera kurdan û kurdan xira bike. Navbera kurdên başûrê Kurdistanê û Amerîkayê xira kirin, niha dora xirakirina navbera kurdan û kurdan e. Çûwalên serê xwe ji bîr kirin, tezkereya 1'ê adare rakirin arîşvê.

Nivîskarê me, li ser girtina Azadiya Welat dengê xwe bilind nake, nivîsa li dijî bêhiqûqiya dewleta tirk, jêkirina zimanê gelê kurd, girtina guhên gelê kurd, siyasî dibîne; bavo, bila li ser Rojîna 6 Tirrt û gotinên wê raweste, binirxîne. Tirkan ew xapand, bire 6 Tirrt û di encamê de tilmiska wê derxistin, piştî hilbijartinan rahişte pîlaxê wê, danî devê derî. Lê naaa, ji wê ye ew edebiyatê dike. Ji bo helwesteke wiha dibêjin, "edebiyata te serê te bixwe".

Girtina Azadiya welat, pirsgirêka ziman e, pirsgirêka edebiyata kurdî ye, pirsgirêka siyaseta kurdî ye, pirsgirêka nasnameya gelê kurd e, pirsgirêka şerê psîkolojîk û encama 30 salên şer û bi hezaran xwîna ciwanên kurd e.
Gelo edebiyat, ji kîjan mijarê ji van cuda tê nirxandin, ey nivîskarê min?




Kadîn

Serkeft Botan
serkeftbotan@hotmail.com



# Du lehengên mêrxas: Rênas û Gernas

Renas û Gernas du hevalên hev şêrên heman çiyayî û beranên heman kozikê bûn. Her du jî hevalên hev torinên Barşowno peyayên Apo bûn. Egîd û şêrînên ber dilê bav û dayikên xwe û fêrisên welatên bindest, têkoşerên azadiyê û sawa dilê dagirkerên faşîstan bûn. Piştî şehadeta Rênas bi çendekî hevalê wî yê şewil û newalan û notirvanê qelaçên rezê bajarokê Barmanê beyî hevalên xwe neqedand û bi pey tolhildana rêhevalên xwe Rênas û şehîdên Amarayê ket. Şapatên çûyî li dijî artêşa faşîst a dagirker li çolterên Şemzînanê piştî şerekî giran bi lehengiyeke mezin xwe gihande hevalê xwe Rênas. Rênasên ciwan qîma xwe bi mey û muzîka awazên çiya ku dawata xwe bike anî û tercîha bi wî alî de da berbûyên xwe ji gerîla, behdîniyan û ji soranan neqand.

Di 9'ê avrêlê de li dora 200 tirimbêlî bi êlek mezin û di bin ronahiya tav û heyvê de û tev stêrên li ezmana xuricîbûn ser daweta Gernas û stêran hetanî şeva nîvê şevê bi diruşm û tilîlî û govendeke giran daweta Gernasê rêhevalê Rênas gerandin û zavayên evîndar xistin hembêza evîndara wî Kurdistan. Gernas bi wê germahî û serhildana gelê xwe bê şik û guman wê bigihînê civîna şehîdan dengê her du zarokên heft heşt salî heta derengiya nîvê şevê ku destê wan ji daweta Gernasê mêrxas nedibû wê xelatî karwanê şehîdan bike. Wê bêje hevalno Kurdistan ji çapelka xilas bûye, rabûye ser lingan û bi tena tena dimeşe. Kurdistanê zaroktiya xwe qedand û ber bi ciwaniya xwe ve dimeşe.

Dengê wan zarokên bajarokê Barmanê wê xelatî karwanên şehîdan bike. Şêniyên bajarokên Barman bi hur û girên xwe bi pîr û ciwanên xwe li cangoriyên xwe li zavayên Kurdistanê xwedî dereketin û lewendî jê re kirin. Dengê tolhidanên ciwanan guhê taht û bendên bajarokên Barmanê ker dikirin.

Lê di xeyal û daxwazên Rênas û Gernas de biratiya gelan, rizgarî û azadiya civaka wan razayi bû. Wan li talanê tu kesî nexistibû, ew li dijî talaniya welatê xwe bûn. Wan çav bera namûsa tu kesî nedabû. Lê ew li dijî bênamûsiya ku li welatê wan dihate kirin disekinîn. Di xeyalên Rênas û Gernas de ku welatê tu kesî dagir bikin tune bû. Lê wan canê xwe yê ciwan ji bo ku dagirkeran ji ser xaka xwe biqewirînin dan ber guleyan.

Gernas û Rênas zimanê tu kesî di devê wan de girênedabûn lê li dijî yên ku zimanê gelê wan di sukufa devê wan de risas kiribûn têkoşîn didan. Gernas û Rênas laqirdiyên xwe bi mezinên tu nijadan nedikirin. Lê li dijî yên ku mezinên wan heywan didîtin û ku ji şaşika mezinên wan ji serê wan dikirin dişewitandin û ji mezinên wan re digotin ka ji me re hêka bikin, têkoşîn dimeşand. Xeyal û armanca Gernas û Rênas perspektîfên însanî bûn ji xwe û ji qewmê xwe hez dikirin û xwe di ser tu kesekî re mezin nedihesibandin, armanca wan sinc û exlaqê mirovaniyê xweş bikin û xizmeta şaristaniyê bikin. Rênas û Gernas aktîvîstên şareza bûn.

Bîr û tevgera wan wê riya gelê kurd ronî û dermale bike.

SERCAN AYDIN

# Encama serdana Obama

Obama hat Tirkiyeyê. Behsa têkiliyên serkeftî hate kirin. Tirkiye ji vê serdanê çi encam derxistiye. Eger bê gotin bi taybetî Tirkiye der barê pirsgirêka kurd de çi encam derxistiye, divê em bêjin ku tu encam dernexistiye.

Bi dehê salan e ka çawa behsa tunekirina PKK'ê tê kirin, dîsa ew gotin tên dubarekirin. Encam ev e; wê Amerîka piştgiriya wan bike û ew ê jî PKK'ê tune bikin. Halbukî bi dehê salan e ku Amerîka piştgiriya wan dike.

Bi serdana Obama careke din hat dîtin ku yên xwe rewşenbîr dibînin jî behsa tunekirina PKK'ê dikin. Li şûna ku li ser çareserkirina pirsgirêkê bisekinin, siyaseta bi salan e dişopînin dîsa wê tînin ziman. Ev nêzîkatiyên wan, mirovan didin fikirandin. Bêguman yên ku dibêjin bi rêbazên berê nabe jî hene. Lê bi giştî ji raya giştî re propagandaya tunekirina PKK'ê tê kirin.

Carna dibêjin; siyaseta me ya heta niha şopandî şaş e. Heta fermandarên kevin jî dibêjin. Lê digerin digerin dîsa siyaseta tunekirinê dixin rojevê. Bêguman ev nêzîkatî baweriyê nade kurdan. Di 29ê Adarê de baş diyar bûye ku ev siyaset baweriyê nade kurdan.

Dibêjin; wê Obama alîkariyê bide me, em ê jî PKK'ê tune bikin. Ev jî delîla wî qasî ye ka li Tirkiyeyê çawa nêzîkî kurdan dibin. Yên xwediyên vê zîhniyetê, piştî ku PKK'ê tune bikin, diyar e ka wê çi bînin serê kurdan.

Divê êdî bê qebûlkirin ku ya gelê kurd kirî hêzeke polîtîk 'PKK' ye. Digel her rengê derfetên dewletê AKP'ê winda kir. Ev encama têkoşîna PKK'ê ye. Her ku hûn devê xwe vekin ku hûn bêjin; em ê PKK'ê tune bikin, wê tu kes bawer neke ku hûnê pirsgirêka kurd çareser bikin. Israîl jî digot em ê Hemasê tune bikin. Ji ber wê tu kesî bawer nedikir ku Israîl pirsgirêka Filistînê çareser bike.

Heta ku Tirkiye dev ji siyaseta tunekirina PKK'ê bernede, wê siyaseta çareserkirinê neşopîne. Tişta ku Tirkiye bike ev e; dema em ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd biryarê bidin û em berê xwe bidin çareseriyê, wê PKK'ê ji pirsgirêkbûnê derkeve. Ya rast ku bi vê têgihînê tevbigerin. Lewre PKK'ê gelek caran gotiye; ji bo hêsankirina çareseriyê em amade ne.

Kî çi dibêje bila bêje, pîlana tunekirina PKK'ê pîlana tunekirina kurdan e. Heta ku nasname neyê naskirin, heta ku kurd weke îradeyeke siyasî neyên dîtin, heta ku bi zimanê kurdî perwerde neyê dayîn nayê gotin dewletê dev ji siyaseta inkar û tunekirinê berdaye.

Wê serdestiya siyasî bidome, wê kurd weke îradeyeke siyasî neyên naskirin; asîmîlasyon, saziyên perwerdeyê, çapemenî û çand her roj kûrtir bibin. Ev siyaseta inkar û tunekirinê ye. Gotûbêjên derbarê serdana Obama de nîşan didin ku hê di tunekirinê de israr heye. Ji hilbijartinên 29'ê Adarê encama; divê em vê pirsgirêkê çareser bikin.

Li Kurdistanê 80-90 sal in ka ji bo çi pirsgirêk hene; ka ji bo çi partiyên din winda kirine, AKP'ê jî ji bo wê winda kiriye. Dibêje; em ê li Kurdistanê lêkolînê bikin, em ê fêr bibin ka çima me winda kiriye.

Dive Tirkiye biaqil be. Ku Obama gotiye PKK terorist e, bi gotina wî PKK tune nabe. Di 5'ê Mijdara 2007'an de Bush gotinên tûjtir gotibûn. Jixwe dihat zanîn ku wê Obama wisa biaxive. Lewre berî hinê bi mehekê wezîrê karên derve hatibû, tiştên berê dubare kiribûn.

Tu welat ji vê pirtir nikare alîkariyê bide Tirkiye. Tirkiye ne welatekî kêmhêz e. Tişta ji destê wê hatî kiriye, lê dîsa nikariye çareser bike. Lewre pirsgirêka kurd ne pirsgirêkeke wisa ye ku bi darê zorê bê çareserkirin. Eger Tirkiye pişta xwe bide siyaseta tunekirinê, wê di nava teqanê de bimîne.

Rupel 9+++++:Layout 1 15.04.2009 14:42 Page 1



# Kasêta *Koma Navîn* derket

**Koma Navîn ku ev 18 sal in li Colemêrgê muzîkê çêdike, kaseta xwe ya nû ya bi navê, "Jiyanek Nû" derxist. Koma Navîn diyar kir ku ew dixwazin li awazên herêma Colemêrgê xwedî derkevin**

Koma Navîn ku li Colemêrgê xebatên muzîkê dimeşîne, bi etîketa Huren Prutoksiyonê albûma xwe ya yekem derxist. Koma Navîn di albuma xwe ya bi navê "Jiyanek Nû" ya dê ji aliyê Kom Muzîkê ve bê belavkirin de, ji çanda Colemêrgê sûdeke mezin girtiye. Koma Navîn ku ev 18 sal in li herêmê muzîkê çêdike û beşdarî gelek mihrîcan û bernameyan bûye, ev demeke dirêj bû li ser albumê xebatên xwe dimeşand. Ji endamên komê Fuat Ege, diyar kir ku bi muzîka çêdikin dixwazin xebatên çand û hunerê yên li herêma Colemêrgê derxin ber çavan û anî ziman ku di bin şertên gelekî zehmet de li Colemêrgê xebatên xwe didomînin. Ege, derbirî ku di bin banê NÇM'a Wanê de xebatên xwe didomînin û destnîşan kir ku ji niha û pê de jî dê bi biryariyeke mezin xebatên xwe bimeşînin.



**Li herêmê yekem e**

Fîkret Kaval jî, daxuyand ku ev 18 sal in bi 5 kesan xebatên xwe dimeşînin û bilêv kir ku tenê daxwaza wan ew e ku çanda heyî ya Colemêrgê bigihînin pêşerojê. Kaval, anî ziman ku berî niha li Colemêrgê û derdora wê beşdarî konser, Newroz, bernameyên 8'ê Adarê bûne û wiha got: "Ev ji bo me xebateke girîng bû. Li herêmê jî yekem e."

Di albuma Koma Navîn de 12 stran cih digirin. Herêm, xweza, jiyana rojane, êş û awazên gel di straran de tê ziman. Strana herî sereke jî strana ku ji ber çîrokek li gundê Talêya Colemêrgê qewimiye hatiye çêkirin a bi nav "Loriya Mendelî" ye. **COLEMÊRG**

# Wêneyên 'Li lûtkeyên tunetiyê'

Wênesaz Gokhan Aslan pêşangeha xwe ya wêneyan a şexsî ya yekemîn a bi navê 'Li lûtkeyên tunetiyê' li Amedê li salona pêşangeha Birca Bizinê vekir. Wênesaz Aslan diyar kir ku jiyan tenê ji objeyên şênber pêk nayê û ji ber vê jî wî 'Lûtkeyên Tunetiyê' tercîh kiriye.

Wênesaz Gokhan Aslan bi pêşangeha xwe ya şexsî ya yekemîn a bi navê 'Li lûtkeyên tunetiyê' ku di heman demê de Aslan ji xwe re Suprematîzmê ku Malevîch pêşkêşî wê kiriye esas digire û bi vî awayî derket pêşberî hezkiriyên wêneyan. Suprematîzm feraseta razber a geometrîk li pêş dixe. Aslan diyar kir ku di xebata wî de şiklên geometrîk û hemû tonên rengan hene. Gokhan Aslan der barê pêşangeha xwe de axivî û destnîşan kir ku di wêneyên xwe de xwestiye ku reng, şikl û bêdengiya hundirê mirovan derxîne pêş. Her wiha wênesaz Aslan di hemû wêneyên xwe de realîst xebitiye. Aslan li ser pêşangeha xwe wiha axivî: "Ez kompozîsyonên xwe li ser razberiyê ava dikim. Di tabloyên xwe de zêdetir rengên esas bi kar tînim. Ev cureyên wêneyan cesaretê dixwaze. Ez di wêneyên xwe de hemû tiştî ne şênber, razber difikirim û bi wî rengî di wêneyên xwe de didim xuyakirin. Min di wêneyên xwe de herî zêde ax, zîft û spatula bi kar anî. Ev tarza min di wêneyên min de jî reseniyê derdixe holê. Ev wêneyên min di 2 salan de derketin holê. Ev xebata min a yekemîn e. Wêneyên min hem tên ecibandin û hem jî nayên ecibandin. Kesên ku diecibînin wî cureyê wêneyan nas nakin."



**'Evîn, hezkirin û wekhevî…'**

Aslan da zanîn ku hin kes hene ku bi tenê meraqa wan li ser vî cureyê wêneyan e û wiha pê de çû: "Di wêneyên min de her tim evîn, hezkirin û wekhevî esas e. Di tabloyeke min de ji sedî zêdetir sembol hene. Her wiha di tabloyeke xwe de jî min xwest ku ez li ser çapemeniya azad û alternatîf bixebitim. Zextên li ser çapemeniya azad û kesên ku di wê riyê de jiyana xwe ji dest danê vebêjim. Ligel vê yekê xebatên min yên wisa gelek in. Min li ser dayika xwe jî tabloyek çêkiriye. Li gorî min her tişt di wêneyan de baştir tê fêmkirin."

**Hediye ABÎŞ**
**AMED**


*Ji gelê me re*

SPASÎ

Gelê me ku li hemû qadan daxwazên xwe yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd anîn ziman di vê hilbijarinê de ew daxwazên xwe di sindoqên hilbijartinê de jî anîn ziman û serkeftin bi dest xist…
Serkeftina Çelê pîroz be!

DTP

Rêxistina DTP'ê ya Colemêrgê
Şaredarê Çelê Mehmet Kanar
Endamên Meclîsa Şaredariyê



*Sîtavka Binevşî*

**Omer Dilsoz**

omerdilsoz@yahoo.com




# Azadiya Welat

Îro dora min a nivîsê ye, min dixwest wekî her carê di pêjna peyvê de hevîrê peyveke dîtir bistrim û li ser wê gotara xwe bipêjim…

Lê, carina bûyerek diqewime û pê re stûyê hemû peyvan dişkê. Bivê nevê pêjnek ji hundirê te berê te badide û tu jî bi bûyerê re radibî û rûdinî; a herî girîng jî, peyvên te diçine ser bûyerê û dihêlin ku tu jî bi zimanê bûyerê biaxivî û bi çavê bûyerê berê xwe bidî bûyeran…

Ji ber hindê jî, vê carê min dil heye li ser girtina mehekê ya rojnameya me Azadiya Welat pişta çend gotinan bişikênim.

Ez ê gavekê pêşde biçim û hemû gunehê bavêjim stûyê 'konsepta nû' û girtina Azadiya Welat jî bînim ser vê sêlê û bihêlim bila bi rûnê xwe de biqele.

Azadiya Welat dengê 'xwerû' bi kurdî di çarçoveya 'konsepta welatîbûna Tirkiyeyî' ew a ji aliyê serkanê Tirkiyeyê Îlker Başbug paşa ve hatiye 'pesendkirin' dengekî 'jêr' e û li gorî vê çaviya jê re hatiye destnîşankirin, li ser pilê ye, mimkûn û 'mûbah' e her dem bikeve ber devê dasa edaleta jorîn ew a di bin nîrê apoletên paşa û paşaizmê de tête birêvebirin.

Azadiya Welat, wê rojê jî, wekî her carê xwe ji bo hejmareke nû amade dikir û hema bêje, ji bilî du rûpelên germ rojname li ber çapê bû…

Keda rojekê bi avê de çû; telefonek hat. Hate gotin, "Ceza lê hatiye birîn" di awirên her kesê de vê pirsê xwe dida der, "Çima?"

Xasma, dê bi 'operasyoneke flash' ya sibetirê zelaltir bûya 'bersiva vê pirsê' yê mayî, jixwe tenê 'teferuat' bû.

Her pêl bi hejandinekê dest pê dike; berî rabûna pêlê bêdengiyeke ker xebera 'nebixêr' dide. Ji bo her pêlê 'eyarek' nû divê; ji bo ku eyar baş bête duristkirin jî, diviya hinek pel û ta jê bêne kirin.

**Her pêl kesixandineke nû ye.**

Ji bo kesixandin û çavtirsandinê bi 'konsepteka –made in paşa- nû' diviya berî her tiştî piçekî dengê jêrîn ê xwerû kurmancî bihata hişkirin û piştre jî dasa edaleta jorîn 'operasyoneke kesixandinê' bidaya destpêkirin.

Azadiya Welat mehekê tune ye. Lê Rojev li şûnê ye; ev çîroka 'heke ew dikarin bigirin em jî dikarin ya nûtir vekin' û berêkdana 'ya me ji ya we xweştir e' bi hemû leza xwe di kirasê konseptan de sermijara 'Rojeva me' ne.

Jixwe karê rojnameyekê jî her ev e; li ku bûyer û qewmîn, li wir e, lê carina ew bi xwe dibe nûçeya xwe û dasa 'edaleta jorîn' wekî mirc û balyozekê li ser serê wê digere.

Girtina Azadiya Welat berî lutf û akredîtasyona paşayê mezin a hin rojnamegerên fikircuda yên bi zimanê jorîn, ya qebûla bo 'nirxandina salekê ya generalkî' belkî aliyê herî rast ê 'edalet û demokrasiya Tirkiyeyîbûnê' ye.

Starda 'Tirkiyeyîbûnê' bi girtina Azadiya Welat û operasyona 'kesixandina DTP'ê' û bêtesîrkirin û terorîzekirina biyavê piştî hilbijartinê, hate dayîn.

**Gelo ev elameta çi ye?**

Bi aqlê kurmancî yê dûmahîkê mirov dikare xwe bigihîne encameke wisa; Riyek tenê ya Azadiya Welat heye, ew jî azadiya welatî ye…

# Hedefa wî orkestraya odeyê ye

Ciwanê kurd Berxwedan Alîşer Koçkaya ku li Londonê ji dayik bûye û li wir mezin bûye di beşa Gîtar ya Fakulteya Muzîkê ya Koleja Trînîtyê ya Londonê de bi cih bû. Li hemû cîhanê ji bo ku xwendekarên muzîkê bikevin vê dibistanê dikevin nava hewldanan. Her wiha dibistan salê tenê 8 kesî qebûl dike. Ciwanê kurd ku ji Ulaşa Sêwasê ye diyar kir ku hedefa wî ev e ku rîtma muzîka rojhilat û rojava bi hev re bi bi kar bîne û okestrayek odeyê ava bike.

Her sal ji cîhanê xwendekarên muzîkê ji bo ku di vê dibistanê de bixwînin dikevin nava hewldaneke mezin. Lê dibistan bi sînor xwendekaran digire. Ji vana yek jî ciwanê kurd Berxwedan Alîşer Koçkaya ye. Koçkaya ji aliyê mamosteyê xwe ve tê hezkirin û her wiha mamosteyên wî di pêşerojê de wî wekî muzîsyenê klasîk dibînin. Koçkaya di muzîkê de bi şîroveya xwe ya cuda balê dikişîne ser xwe. Koçkaya hewl dide ku muzîka klasîk ew a ku ji dema Baroka mayî têbigêhije.



**Ji malbatê dest pê kir**

Berxwedan Koçakaya di nava 8 kesî de hêjayî Beşa Gîtarê ya Koleja Trînîty hate dîtin. Koçkaya diyar kir ku eleqeya wî ya muzîkê bi saya malbata wî dest pê kiriye û dê û bavê wî jî bi muzîkê re mijûl dibin. **LONDON**

www.arsivakurd.org

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Gelê me yê birûmet, ligel hemû astengiyan bi awayekî zelal tercîha xwe danî holê. Em kesên ku keda wan di vê serkeftinê de heye, bi taybetî jî jin, ciwan û welatparêz, dost û hemû gelê xwe pîroz dikin…

DTP 2005

**Rêxistina DTP'a Golyaziya Cîhanbeyliya Konyayê**
**Şaredar Molla Şîmşek**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Gelê me careke din ji bo jiyaneke azad îradeya xwe nîşanî her kesî da. Piştgiriya hêvî û çareseriyê kir. Em vê sekna bi rûmet a gelê xwe silav dikin.

DTP 2005

**Rêxistina DTP'a Misoriya Mêrdînê**
**Şaredar Abdulkerîm Adam**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Gelê me wezîfeya xwe pêk anî û ev peywir da ser milê me, em ê jî bi her awayî hewl bidin ku bibin bersiva hêvî û daxwazên gelê xwe, bibin xizmetkarên riya ku gelê me ji xwe re hilbijartiye.

DTP 2005

**Rêxistina DTP'a Qilabanê ya Şirnexê**
**Şaredar Şukran Sincar**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Em serkeftina gelê xwe bi dil û can pîroz dikin. Gel ji bo jiyana azad û pêşeroja azad piştgirî da siyaseta demokratîk. Gelê kurd û alîgirên demokrasiyê bi hest û baweriya rojên azad vîna xwe di sindoqan de nîşan da. Spas ji bo hemû kedkarên hilbijartinê.

DTP 2005

**Rêxistina DTP'a Aydinê**
**Şaredarê Ovaemirê Muzaffer Yondemlî**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Em kesên ku keda wan di vê serkeftinê de heye bi taybetî jî jin,ciwan, saziyên demokratîk û welatparêz, dost û hemû gelê xwe pîroz dikin.

DTP

**Rêxistina DTP'a Pîranê ya Amedê**
**Şaredarê Kaygisizê Mehmet Salîk**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Gel ligel hemû zext û zehmetiyan helwesta xwe ya bi rûmet nîşan da. Em gelê xwe yê ku ji bo jiyaneke azad vîna xwe bi zelalî di sindokan da nîşan da silav dikin û spasiya xwe pêşkêş dikin.

DTP

**Rêxistina DTP'a Kocakoya Amedê**
**Şaredar Remzî Çalli**
**Endamên Meclîsa Şaredarîyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Tevî hemû astegiyan, tevî hemû hewldanên xapandin û zordestiyan gelê me li dengên xwe û li partiya xwe xwedî derket û di encamê de serkeftineke berbiçav bi dest xist. Em soz didin gelê xwe ku em ê li gorî vîn, daxwaz û hêviyên gelê xwe tevbigerin û em ê bi hev re bi ser bikevin û destkeftiyên mezintir bi dest bixin.

DTP

**Rêxistina DTP'a Serêkaniyê ya Rihayê**
**Şaredar Îsmal Aslan**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ

Dawiya hemû zehmetiyan firehî ye, gelê me gelek zehmetî, êş û kul dîtin, gelê me gelek bedelên mezin dan ta ku em gihan van rojan. Em soz didin gelê xwe ku em ê li gorî hêvî û xwestekên gelê xwe tevbigerin û bi hev re bajarên azad û xweş ava bikin.

DTP

**Rêxistina DTP'a Sixkê ya Wanê**
**Şaredar Nezahat Erguneş**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

*Ji gelê me re*

# SPASÎ


Ev peywira ku gel daye me gelekî hêja ye; heta ku em daxwaza pîroz a gel bi serkeftineke mayînde taceser bikin çi pêwîst bike dê bi sozdariyeke mezin bê kirin. Em yên ku keda wan di vê serkeftinê de heye, bi taybetî jî jin, ciwan, saziyên demokratîk û welatparêz, dost û hemû gelê xwe pîroz dikin

DTP

**Rêxistina DTP'a Xelfetiyê ya Rihayê**
**Şaredarê Yukari Gokluyê Bazo Yilmaz**
**Endamên Meclîsa Şaredariyê**

www.arsivakurd.org

## ROJEVA EYŞO









Îkram BALEKANÎ
balekani@hotmail.com

# 'Bi ROJÎN'ekê 30 Tirşikçî'

Wekî hûn jî dizanin AKP'ê xwest ji bo hilbijartinan me bixapîne. Ji bo vê yekê TRT 6 vekir û hin stranbêjên kurd jî bi pere kirê kirin. Yek ji wan jî Rojîn bû. Îca hilbijartin xilas bû, dema kirêkirina Rojînê jî xilas bû. Yanî ew jî vin...

Rojînê guh neda hawara gel, li berjewendiyên xwe fikirî û bi gotina tirkî "balıklama" xwe avête ser TRT'ê, bêmane.

Hilbijartin hatin û xilas bûn, êdî karê wê jî nema. Ger gotin cihê xwe bigire; bû destmala ber destan.

Ez ne şaş bim we texmîn kir behsa kîjan destmalê dikim.

Niha jî Rojîn îdia dike ku bi xwe ji TRT'ê derketiye, lê TRT jî dibêje, me ew derxist. Kîjan rast dibêje, ne girîng e.

Ji bo gelê kurd her tişt zelal e jixwe. Gotineke kurdî heye dibêjin: "Avahiya gundan ji panitiya rê kifş e."

Encama TRT'ê jî ji destpêkê xuya bû.

Rojîn dibêje: "Ez çûm, min dît û derketim" (Mala Xwedê ava, piştî ku tiliya xwe xistin çavên te, tu şiyar bûyî. Yadê jixwe ne hewce ye ku mirov ji bo pê bihese û bibîne, here bikeve hundir. Hema çavên xwe veke û li êrîşên li ser gelê kurd binêrin, tê her tiştî bibînî."

TRT jî dibêje: "Ew hat, me x...ê û derxist!" Bêmane yanî. Dibe ku ya TRT'ê rast be.

Ji ber ku hilbijartin xelas bûn, êdî pêdiviya wan bi reklamê tune ye.

Lewre ji bo ku çavê Yekitiya Ewropayê boyax bikin, wê tenê çend saetan weşana bi kurdî bikin.

Jixwe navê TRT 6 jî Telvîzyona Pirzimanî ya Tirkiyeyê ye.

Lewre wê weşana erebî û farisî jî lê zêde bikin û weşana kurdî kêm bikin.

Bi vî rengî wê bi tîrekî li du nîşanan bixin û bi Rojînekê li 30 -40 tirşikçiyan bixin. Ew pereyên ku didan Rojînê têra wan dike ku 30-40 tirşikçiyên din bikirin û ji xwe re bikin hemal.

Rojîn hat û vala çû<br>
Bi kêf hat û bi zirt çû<br>
Kenê guran bi wan tê<br>
Proja wan çem û çem çû<br>
Nexşe li Nîluferê be (Aqûbet li serê Nîluferê be)

Heyfa wî navê ku lê hatiye kirin.

Bila qurbana navê xwe be.

***NOT:***

*Ez jî li ser navê "xwe" girtina Azadiya Welat, operasyona çewsandinê ya li ser saziyên kurd û yên li ser DTP'ê bi tundî şermezar dikim. Bi rastî ew rewşa li Tirkiyeyê jî dişibe daweta "ereban". 3 gavan diçin pêş û du gavan paşve tên.*

*Ew jî gotineke xweş dibêjin û 15 êrîşan dikin. Xwedê bi xêr bike.*

Ji gelê me re SPASÎ

Gelê me li hemû qadan daxwazên xwe yên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd anîn ziman. Her wiha helwesta xwe li dijî astengî û zordariyê jî di sindoqan de nîşan da. Em vê sekna gelê xwe ya bi rûmet silav dikin.

DTP

Rêxistina DTP'ê ya Agiriyê
Şaredarê Patnosê Yûsûf Yilmaz
Endamên Meclîsa Şaredariyê

Ji gelê me re SPASÎ

Gelê me bi coşeke mezin piştgirî da siyaseta DTP'ê.
Em kesên ku keda wan di vê serkeftinê de heye,
bi taybetî jî jin, ciwan, saziyên demokratîk û welatparêz,
dost û hemû gelê xwe pîroz dikin.

DTP

Rêxistina DTP'ê ya Nisêbînê
Şaredar Ayşe Gokkan
Endamên Meclîsa Şaredariyê




## Ahmedê Gogê û 'kurdîtiya' wî

Serwerê parê li radyoya kurdî ya Yêrêvanê Ahmedê Gogê, ku gerekê rind haj ji kurdan û Kurdistanê hebûya, ku bikaribûya bi milyonan guhdarên xwe re bipeyîviya, lê zanebûnên wî hem di aliyê kurdewariyê da kêm bûn, hem jî di aliyê entelektûaliyê de.

Rojekê kurdekî Diyarbekirê tê radyoyê û Ahmed jî dixweze kurdîtiya xwe nişan bide, jê dipirse: "Li Diyarbekirê bi kurmancî dipeyivin an soranî?". Lê di meqaleyeke xwe de ya der heqê terzîxaneyeke mezin de, kurdewariya xwe awa anîbû zimên: "Ev cilên, ku li vira têne dirûnê, kurd jî dikarin bikirin û li xwe bikin".

ROJEV

16 Nîsan 2009 Hejmar:1 Sal: 1

**ROJEV**
**Zin Basın Yayın**
İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu
Yazı İşleri Müdürü
**Cesur YILMAZ**
***Adres:***
Şehit Muhtar Mahallesi
Yoğurtçu Faik Sokak No:12/2

***TEL:*** 0 (212) 253 93 34
***Fax:*** 0 (212) 244 06 52
Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece / İstanbul

***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu
Gazetecilik,
Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
***No:*** 44 Seyhan
Edene
**Yayın Türü:** Süreli




Li Serêkaniyê 28 gund ji ber ambargoya TÎGEM'ê di tariyê de dijîn. Gundî ji hemû xizmetên ceryan, av û rê jî bêpar hatine hiştin. Gundî bi salan e têne mexdûrkirin

# Ji ber ambargoyê di tariyê de dijîn

Li navçeya Serêkaniyê ya Rihayê 3 hezar û 700 kesên ku li 28 gundên di nava sînorê TÎGEM'ê de mane, ji ber ambargoya TÎGEM'ê, ji mafê ceyran, rê, av û xizmetên din bêpar hatine hiştin û bi salan e di tarîtiyê de dijîn. Gundiyan xwest ku parlamenterên DTP'ê alîkariyê bidin wan û li ser pirsgirêkên wan rawestin.

Midûriyeta Giştî ya Karîgeriya Çandiniyê ya Serêkaniyê (TÎGEM), piştî di sala 1943'an de li Serêkaniyê ava bû axa 28 gundan xiste nava sînorê xwe. 3 hezar û 700 kesên ku li 28 gundên di nava sînorê TÎGEM'ê de dijîn bi dagirkeriya TÎGEM'ê rastî ambargoyê hatin. Ji ber ku TÎGEM destûr nade gundî avahiyan saz bikin, ceyran û avê bikişînin malê xwe ji aliyê TÎGEM'ê ve tecrîta xizmeta civakî dijîn.



**'Em cih ji miriyên xwe re nabînin'**

Welatiyê gundê Hamîda Kombesî Îbrahîm Yildiz, diyar kir ku ku piştî TÎGEM li Serêkaniyê ava bû û şûnde hemû gundên di nava sînorê wê de man tev rastî ambargoya xizmetê hatin û li ser wan tecrît tê meşandin. Yilmaz, destnîşan kir ku ji ber tecrîta li ser wan ew di nava şert û mercên herî kevn de dijîn û wiha got: "TÎGEM di sala 1943'an de li Serêkaniyê ava bû. Lê belê berî ku TÎGEM li vir ava bibe bi sedsalan bapîrên me li ser vê axê çandinî kirin û sewal xwedî kirin. 28 gundên di nava sînorê TÎGEM'ê de man di fermiyetê de hatin rakirin ji hemû xizmetên av, rê û ceyranê hatin bêparkirin. Li ser vê yekê Parlamenterê DTP'ê yê Şirnexê Hasîp Kaplan pirsgirêka gundên me û dagirkeriya TÎGEM'ê bir meclîsê. Em dixwazin vê mijarê bişopîne û her tim li ser raweste. Di hilbijartina 22'ê tîrmehê de Wezîrê Çandiniyê yê AKP'ê Mehdî Eker soz da me ku gundê me bixe nava statuya gundan û di fermiyetê de wekî gundan qeyd bike. Lê belê piştî deng ji me girtin û hilbijartin bi dawî bûn em û soza xwe tev ji bîr kirin. Niha em ji hemû mafê xwe bêparin. Cihê ku em miriyê xwe lê definn bikin tune. TÎGEM destûr nade ku em miriyên xwe jî veşêre. "

Welatiyê bi navê Huseyîn Genç jî bal kişand ser pirsgirêkên xwe û wiha got: "Li 28 gundan nêzî 3 hezar û 700 kes dijîn. Ji ber tecrît û ambargoyê hemû kes ji mafê perwerdehî û tenduristiyê bêparin. Em di xaniyên ax de dijîn. TÎGEM destûr nade ku em xaniyên xwe nû bikin. Em bê av dijîn û bi tankeran avê ji derve tînin. Em û sewalên xwe heman avê vedixwin. Ji ber ku xizmeta rê nadin me zivistanê bi hefte û mehan em di gundê xwe de mahsûr dimînin.



**Di riyan de jiyana xwe ji dest didin**

Latîfe Denîz ku di nava şert û mercên giran de dijî anî ziman ku piştî ew zewicî û şunve di mala xaniyên ax de dest bi jiyanê kir û wiha axivî: "Ez beriya bizewicim li bajar dijiyam. Piştî ku ez zewicîm hatim mala hevserê xwe. Malbata hevserê min li nava sînorê TÎGEM'ê ye. Ji ber ku di nava sînorê TÎGEM'ê de ye destûr tune ku xanî ji xwe re ava bikin. Malbata xezûrê min di kon û xaniyên axînî de dijîn. Ji hemû xizmeta civakî û bingehîn dûr in. Niha 5 zarokên min hene. Min hemû di nava tarîtiyê de mezin kirin. Em neçarin bê av, ceyran û rê bijîn. Niha li ser me tecrît û ambargoyek heye." Pîra 70 salî Zehra Yildiz jî anî ziman ku ew gihişt temenê 70 salî lê belê hîn bê av û bê ceyran dijîn û xwest xizmet ji wan re bê kirin. **RIHA / DÎHA**

# Projeyeke hevpar amade dikin

Şaredariya DTP'î ya Bajêrgeyê dest bi paqijiya çemê di nav bajarokê ku li sînorê Tirkiye û Îranê ye re derbas dibe, kir. Şaredariyê ji bo paqijiya çemê Bajêrgê deriyê bazirganiyê yê di navbera Îran û Tirkiyeyê de cih digire bi Şaredariya Ûrmiyeyê re projeyek hevpar amade kir. Tê xwestin ku di çarçoveya projeyê de tevahiya çem bê baqijkirin û ji qrêjiyê bê parastin. Der barê projeyê de Wekîlê Şaredarê Bajêrgê Nasir Buyuksu, destnîşan kir ku Bajêrge xwedî ciheki stratejîk e lê zêde hatiye îhmalkirin. Buyuksu, anî ziman ku ew dê ji bo pêşxistin û hemdemiya bajarokê xebatê bimeşînin û wiha got: "Di serî de ji bo paqijiya çemê nava bajarokê me û Şaredariya Ûrmiyê xebateke hevbeş da destpêkirin. Em dê bi paqijkirina çem dest bi xebata xwe ya sifrê bikin."

**Şitlan diçînin**

Buyuksu anî ziman ku wan piştî çem paqij kir, ji bo ji qirêjiyê û dîmenên qirêj biparêzin dê dest bi çandina daran bikin û hemû derdora çem bikin dar û ber. Buyuksu wiha axivî: "Ji ber ku ava çem qirêj e mirov nikarin jê sûd wergirin. Ji bo ku welatî karibin sûdekê jê wergirin em di serî de dê paqij bikin û piştre jî derdora hemû bikin mîna daristanê. Her roj bi dehan mirov li vir diçin Îranê û tên. Divê ji bo van mirovên ku her roj diçin û tên wareki xweş lê rûnên û îsihahet bikin hebe. Em ê li aliyekî derdora xweş û dîmenek xweş ava bikin, li aliyê din em dê çavkaniya aborî vekin."



**Çavkaniya herêmê**

Serokê Odeya Pîşesazî û Sinetkaran a Geverê Îrfan Sari jî der barê projeyê de diyar kir ku projeyek gelek baş e û wiha got, "Ger ku Şaredarî vê bajarokê bînin asta ku tê xwesin û pêş bixin, dê hemû herêmê di warê aborî de xwedî bike. Li vê bajaroka ku di sînorê Tirkiye û Îranê de ye û deriyê bazirganiyê ye ne otel û ne jî aşxaneyek lê heye. Divê hemû amadekarî bêne kirin. Ji ber vê yekê ev xizmet girîng e. Divê her kes jî piştgiriyê bide vê projeya bajarokê." **COLEMÊRG / DÎHA**

## Kêm ranekevin

**NEW YORK** - Pisporan diyar kir ku rojê ji 7 saetan kêmtir razan ji bo tenduristiya mirovan ne baş e. Heke mirov kêm razê dê serma bigire. Di encama lêkolîneke li Amerîkayê hate kirin de derket holê ku kesên ku ji 7 saetan kêmtir radizên li gorî kesên din 3 qat zêdetir sermayê digirin. Pisporan diyar kir ku kêm razan metabolîzmaya mirovan qels dike û laşê mirov li hemberî vîrûsan nikare li ber xwe bide. Ji ber vê yekê jî pispor dibêjin ku ji bo tenduristiyê divê mirov baldar be.

## Filîpînî xwe didin xaçkirin

**MANÎLA** - Bi dehan filîpînî di îna êşan de, ango roja bîranîna xaçkirina Jesus Christus (Îsa) , xwe dan xaçkirin. Hinekan ji wan jî li xwe dixistin û stranên li ser êşên Îsa û mirina wî digotin. Weke tê zanîn îna êşan roja berî bîranîna rabûna Îsa ji mirinê ye. Li gundê Cutud, 80 km nêzîkî Manîla, salan e çîroka êşên Jesus tê pêşkêşkirin. Bi mîxan li dest û lingan dixin û xaça giranbûna wê 50 kîlo hildigirin. *(avesta)*



# Geverî nikarin pincarî top bikin

Li navçeya Gevera Colemêrgê bi hatina biharê gelek pincarên weke lûş, mende, keliş, tirşik, kirvar (kengêr), istirik, çiriş, elo, hingêdan, pûngê siyabû li dezgehan cihê xwe girtin. Ev pincar û nebatên ku tên li ser sifreyên welatiyan bûye çavkaniya debara welatiyên xizan jî. Lê ev pincar û nebatên ku hem weke xwarin tên li ser sifreyan û hem jî bi şîfa ne ji ber operasyonan bi rehetî nayê topkirin.

Pincar bêhtir li çiyayê Simbil, Şemzînan û Çelê şîn dibin. Lê pincarfiroş dibêjin ku ji ber li van herêman operasyon hene nikarin biçin. Ji ber vê yekê jî dixwazin di demeke kin de ev operasyon bêne rawestandin.

Welatiyê bi navê Ekrem Çalli diyar kir ku ew di sala 1994'an de ji ber pêkutiya dewletê ji gundê Şivişka bi ser Çelê koç kirine. Zivistanê bi masiyên ku ji çemê Zê digirin debara xwe dikin û bihar û havînê jî bi pincar û nebatên ku li çiya top dikin debara xwe dikin. Çalli got ku piştî ku ji gundê xwe derketine di warê aborî de hatine asta têkçûnê û wiha axivî: "Niha ji bo ku debara 15 kesan bikim li çiya pincarê top dikin. Lê cihên ku herî zêde pincar hene operasyon didomin. Ji ber operasyonan en nikarin pincarî top bikin. Ewlehiya canê me nîn e ji ber vê yekê jî bi rehetî nakirin tevbigerin. Êdî divê ev pirsgirêka ewlehiyê bê çareserkirin."

Welatiyê bi navê Arafat Taş jî diyar kir ku ligel operasyonan ji ber pêkutiyên cerdevanan jî nikarin nebat û pincarê top bikin. Cerdevan dema ku ew dikevin herêmê an jî ji wir derbas bidin ji wan re astengiyê derdixin. **COLEMÊRG**

www.arsivakurd.org